Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî · Jimar :1343 · 18-Çile-2026 · www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Şîrîn Omer heya hênaseya xwe ya dawiyê ji bo welat têkoşîn kir

**Ayşa Silêman/ Dêrik**

**Yadê Şêrîn wek dayika aştiyê dihat naskirin, li Bakur û Rojhilatê Sûriyê xwedî rol û sekneke bi wate bû, hemû jiyana xwe di xizmeta rêxistinê de derbas kir û heya nefesa xwe ya dawî li ser fikirê Rêber Apo bû.**



### Kurtejiyana Yadê Şêrîn

Şêrîn Omer di sala 1957'an de li bajarê Dêrikê jidayîk bûye û li wir mezin bûye, ew û xwîşk û birayên xwe di nav xiristiyaniyan de jiyana xwe qedandine. Yadê Şêrîn ji zarokatiyê ve dihat naskirin bi jîr û zane bûnê, berê xwe dida kur xwedî qedir û qîmet bû, hertim hebûna xwe çêdikir. Ew ji piçûkaniya xwe ve degel bû ji tu kesî neditirsa piştgiriya hemû xwîşk û birayên xwe dikir. Piştî zewicî li gundê Qidêrîkê biceh bû û li wir gelek astengî dikşandin tevî wilo jî îradeya wê xurt bû, tu carî westandin li cem wê nebû. Piştî demekî careke din berê xwe dan bajarê Dêrikê û li wir bicih bûn. Di sala 1980'î de ji nû ve Partiya Karkerên Kurdistanê derbasî Rojavayê Kurdistanê bûn û fikrê Rêber Apo belav bû. Yê yekem ji malbata yadê Şêrîn Şehîd ket Şehîd Ceger Sêfo bû ji gundê Tilxenzîr, şehadeta wî bandoreke mezin li yadê Şêrîn kir û girêdana wê ya xurt çêbû bi Rêber Apo re. Fikrê yadê Şêrîn vekirî bû yekser rêxistin qebûl kir û biryar da li pişta wê bê. Hevjînê yadê Şêrîn partiya Paşverû bû lewma gelek nakokî di navbera wê û hevjînê wê de derdiketin, lê bi israra wê û keda ku dikir hevjînê wê jî hat ser xeta wê.

### Welatparêzî di nav xweîna Yadê Şêrîn de bû

Yadê Şêrîn deriyê mala wê hertim ji rêxistinê re vekirîbû û destek dida wan, gelek civîn û niqaş di mala wê de dihatin çêkirin. Yadê Şêrîn xwedî bandor bû herkesî jê hez dikir û baweriya wan pê dihat, ew gelekî zane bû li kur axivîban herkesî lê guhdar dikir. Pirî caran rêjîma Baas di ser mala wê de digirtin lê tu belge nediketin nav destê wan de. Pirî caran bi çiwalan çek hildigirt ser milê xwe û nîvê şevê di nav goristananê de vedişart da ku nekeve nav destê rêjîmê de. Piraniya kesên derdora wê bi riya wê tevlî xebatên Partiyê bûn ji ber ku ew xwedî bandor bû, ew wek dîroka rêxistinê dihat naskirin. Wê cihê xwe jî di gelek cihan de girtiye, dema Şoreşa Rojava destpêkir yadê Şêrîn hertim li ser sînorê Bakurê Kurdistanê bû û qoriya bû. Hertim bar digirt ser milê xwe û xwe dida pêş, di heman demê de ew bû dayîka aşitiyê û li herçar parçeyên Kurdistanê geriya heye Ewropa.

Yadê Şêrîn di sala 2003'an de yekem jina ku ket zindana rêjîma Baas de, 4 meh û 10 rojan di zindanê de ma tevî işkenceya ku li ser dihat kirin jî lê rêjîmê tu agahî ji devê wê negirtin. Herkesî digot ku piştî vê zindanê yadê Şêrîn tucarî sax dernakevê, lê wê baweriya xwe bi Rêber Apo anîbû û careke din xwe li ser piyan girt. Tişta herî zêde hêlişt Yadê Şêrîn bi vê xetê ve girêdayî bê fikrê Rêber Apo bû, wê hertim digot ma dem Rêber Apo ji bo jinan evqas têkoşînê dike û wê şoreşekî li darbixe, erkê me ye jî em destek bidin vê şoreşê û li ber xwe bidin heya ku jin bighêje azadiya xwe.



### Yadê Şêrîn mînaka jina azad bû

Dema kurên yadê Şêrîn Isam û Ferhad şehîd ketin rewşa wê ya tenduristî nebaş bû herkesî hêviyên xwe jê qut kirin, lê wê bi hêz û îradeyeke xurttir xwe li ser piyan girt, ji derdorê re digot piştî min kezeba xwe da divê ez karê xwe zêdettir xurt bikim. Tevî wilo jî şehadeta wan birînek di canê wê de çêkir, lê mixabin hêdî hêdî nexweşiyê ew da erdê tevî ku li berxwedida jî lê êşa wê giran bû. Di 9'ê îlona sala 2025'an de çû ser dilovaniya xwedê lê li şûn xwe şopek dagirtî ked, welatparêzî û berxwedanî hêlişt. Koçkirina wê bandor li seranserî cîhanê kir ji ber ku ew mînaka îrade û sekna jina azad bû. Tevî wilo jî lê şûna wê li her derî zindiye ew rihê wê di her zasiyekî de cihê xwe digre.

Sudoku:Pirs 73

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 7 | 9 | | | | | | 1 | |
| | | | 3 | 7 | | | | |
| | | 8 | 1 | | 9 | | | 3 |
| 9 | | 4 | | 6 | 1 | 3 | | |
| 8 | | | | | | | | 2 |
| | | 2 | 5 | 4 | | 7 | | 1 |
| 4 | | | 8 | | 2 | 9 | | |
| | | | | 3 | 6 | | | |
| | 3 | | | | | | 4 | 5 |

Sudoku: Bersiv 72

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 7 | 9 | 3 | 8 | 1 | 4 | 6 | 2 | 5 |
| 8 | 6 | 4 | 5 | 2 | 3 | 7 | 9 | 1 |
| 1 | 2 | 5 | 7 | 6 | 9 | 4 | 3 | 8 |
| 4 | 8 | 6 | 3 | 9 | 1 | 5 | 7 | 2 |
| 3 | 5 | 7 | 2 | 8 | 6 | 1 | 4 | 9 |
| 2 | 1 | 9 | 4 | 7 | 5 | 3 | 8 | 6 |
| 6 | 3 | 1 | 9 | 4 | 8 | 2 | 5 | 7 |
| 9 | 4 | 2 | 6 | 5 | 7 | 8 | 1 | 3 |
| 5 | 7 | 8 | 1 | 3 | 2 | 9 | 6 | 4 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Di derdê xwe de şewitî:**
- Nikarî pirsgirêkên xwe çareser bike; ji ber kul û derdan wisa lê hat.

**Ez kulecergî bûm/ez kulecergî kirim:**
- Min pir derd kişandin; ez pir qehirîm; min pir kişand.

**Ji derdan rih berdan:**
- Ji ber pirsgirêkan rewşa wan pir xirab bûye.

**Ji kul û derdan rih û simbêl berdan:**
- Bi heman wateyê.

**Kulên dilê wî gelek in/kulên wî gelek in:**
- Pirsgirêk û kêşeyên wî pir in.

**Kulên xwe vereşîn:**
- Derdên xwe ji hev re gotin.

**Te got hirç:**
- Kesê tiştek jê re pir derd be, her dem behsê bike jê re tê gotin.

**(Hirçê li mirovekî xistibû, guhên wî jê kiribûn, kerr bûbû; dema hin diaxiviyan digot; te got hirç?)**

**Yarê diya min yek bûya, minê bi dendikên behîvan xwedî bikira:**
- Derdê min ne yek tenê ye, pir in.

**LI SER ZAROKAN Û PIÇÛKBÛNÊ**

**Bi çeng û per xistin:**
- Mezin kirin.

**Bi hêstirên çavan xwedî kiriye:**
- Di ber de pir êş kişandiye.

**Bi per û bask kirin:**
- Mezin kirin

**Bi per û bask bûn:**
- Mezin bûn.

**Çavên wî li şûn ve neman:**
- Zaroyên xwe baş gihandine.

**Çavên wî li paş neman:**
- Bi heman wateyê.

**Hê li ser nan digirî:**
- Hê zarok e; hê pir piçûk e.

**Li ser destan e:**
- Hê piçûk e; ne dema wî ya meşê ye.

**Serê wî hê di pizdanê de ye:**
- Dema zarokekî piçûk tiştekî nebaş dike, yan dibêje, yan jî dema tiştekî ne li gorî temenê xwe dike, yan dibêje jê re tê gotin.

**Zarokê doh e:**
- Temenê wî ne li jorê ye.

**LI SER RAZANÊ**

**Çavên wî şor bûn:**
- Hinekî raza.

**Çavên xwe germ kirin:**
- Bi heman wateyê.

**Çavên xwe nerm kirin:**
- Bi heman wateyê.

**Çavên xwe şkênandin:**
- Bi heman wateyê.

**Çavên xwe şor kirin:**
Bi heman wateyê.

**LI SER VENÊRÎN, ŞOPANDIN Û ÇAVDÊRIYÊ**

**Di ber çavan re derbas kir:**
- Temaşe kir; careke din lê nêrî; serrast kir; hêre kir.

**Guhên xwe bel kirin:**
- Pir jidil û bi baldarî li derdorên xwe nêrî.

**Min xwe lê kir diz:**
- Bi awayekî ku min nebîne min şopand; min çavdêrî lê kir.

**Xwe li ber kir diz:**
- Ji bo ku bibîne ka wê çi bike li cihê tevgera wî xwe veşart.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## 'Pêwîst e şertên demokratîk pêk werin'



Parlementera DEM Partî Newroz Uysal diyar kir ku ji bo serxistina pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk ji aliyê DEM partî ve gelek xebat tên meşandin û wiha got: "Pêwîst e şertên demokratîk pêk werin."**R-4**


## Denîz Efrîn; Fedayiya berxwedana serdemê

Fermandara hemdem Denîz Çiya sembola jina Kurd a berxwedêr e ya ku teslîmbûn qebûl nekir û çalakiya fedayî kir. Gotina şehîd Denîz Çiya ya dawî ku li dîrokê xist wiha bû: "Yên ku di demên pêwîst de mirinê nedin ber çavan nikarin bibin henaseya jiyana azad."**R-2**



Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî · Jimar : 1343 · 18-Çile-2026 · www.ronahi.net/ku/ · Nirx: 500 L.S

## Koletiya modern; Bazirganiya bi mirovan



Bazirganiya mirovan yek ji sûcên rêxistinkirî yên herî giran e li cîhanê. Tevî hewldanên navneteweyî ji bo têkoşîna li dijî bazirganiya mirovan, ev sûc hîn jî yek ji binpêkirinên mafên mirovan ên herî giran û berbelav li cîhanê ye...**R-7**

# 'DIVÊ NETEWEYÊN YEKBÛYÎ LI DIJÎ DEWLETA TIRK Û HTŞ'Ê HELWEST NÎŞAN BIDE'

Parêzerên kantona Cizîrê anîn ziman ku kiryarên desthilatdariya HTŞ'ê binpêkirina biryarên Neteweyên Yekbûyî (NY) yên bi hejmara 2254 û 2799'an e û bang li NY'ê kirin ku dijî dewleta Tirk û HTŞ'ê helwest nîşan bide.**R-6**



## 'Şanoyeke rexneyî- komîdî li ser xebata rewşenbîrî ye'



Ebdilmecîd Xelef da zanîn ku şanoya Rewşenbîr, şanoyeke komîdî- rexneyî girêdayî xebata rewşenbîrî ye û got, : "Di şanoyê de rewşenbîr komîteyên amadekar û xebata wan dinirxîne."**R-9**

## 'HTŞ'ê hêza xwe ya biryar û leşkerî nîne, Tirkiyê serpereştiya wê dike'

Rojnamevan Ekrem Berekat diyar kir ku yê niha sazî û ragihandina Sûriyê organîze dike, dewleta Tirk e, ji ber hikumeta demkî ne xwedî hêza biryar û leşkerî ye û got, "Di şexsê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê de xwestin Heleb bê Kurd bihêlin û Sûriyê giştî di nava parçebûnekê de derbas bikin."**R-5**



Çanda qesrê û jina malê
İsyan Karadeniz R-2



Dema Ku Ragihandin Zemînê Şîdetê Tapan Bike, Komkujî Rewa Dibe?!
Idrîs Henan R-4



Heleb çi nîşanî me da?
Sînan Cûdî R-6



Dewleta Tirk navenda fitnê ye
Hafiz Turhalli R-7



Em li vîna azad xwedî derbikevin
Gulîstan Xalid R-10

# Denîz Efrîn; Fedayiya berxwedana serdemê

Fermandara hemdem Denîz Çiya sembola jina Kurd a berxwedêr e ya ku teslîmbûn qebûl nekir û çalakiya fedayî kir. Gotina şehîd Denîz Çiya ya dawî ku li dîrokê xist wiha bû: "Yên ku di demên pêwîst de mirinê nedin ber çavan nikarin bibin henaseya jiyana azad."

**Stêrk Mihemed/Qamişlo**

Ji 6'ê Çileya 2026'an ve bi konseptekî qirkirinê û bi erêkirina hêzên hegemon re, çeteyên HTŞ'ê yên girêdayî dewleta Tirk a dagirker êrişekî dermirovî li Şêxmeqsûd û Eşrefiyê dane despêkirin. Li hemberî 2 taxên biçûk her cûre çekên hewayî û bejahî hatiye bikaranîn. Herwiha li hember du taxên biçûk du dewletên mezin ku yek ji wan di nava dewleta NATO daye, êriş kirin. Lê li bermaberî van çeteyan gelê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê û Hêza Ewlekariya Hundirîn berxwedanek mezin dan meşandin û bi qehremaniya xwe di dîrokê de mohra xwe danîn. 5 fedayiyan teslîmiyet qebûlnekirin, heya Kêliya dawî ji bo parastina gel berxwedanî kirin û bi rojan bûn tirs ji dijmin re.

Herwiha di nava kêliyên şer de silogana " Bê Serok Jiyan nabe û Berxwedan Jiyane" li hember dijmin dihat qêrîn. Hemû fedayî bi israreke mezin li ser Fikir û felsefeya Rêber Apo tevdigerîn û heya kêliya dawî ji Şihadeta wan rexnedayîna xwe li hember gel û hevaltiya kêm didan.

Yek ji jinên Kurd ku ji Çiyayê Kurmênc e bi rojan ji çeteyan re bibû derd û nikarîn îradeya wê bişkînin. Fermandar Deniz Çiya heya Kêliya dawî liberxweda û teslîmkirin qebûl nekir herwiha ji bû nekeve destê çeteyên hikumeta demkî a girêdayî dewleta Tirk çalakiya Fedayî kir û bû mînaka jina Kurd a berxwedêr.

### Dest ji têkoşîn û berxwedaniya xwe bernadin

Di destpêkê de Fermandarê taxima Fedayî, Hawar Qendîl bû. Hawar Qendîl di despêka şer de bi motivasyona xwe ya bilind ku moralê xwe ji felsefeya ku tu caran bi bin nakeve ya Rêber Apo digre, ji hemû hevalan re dibe hêza moralê. Hemû heval bi xwestek û wêrektiyek mezin cihê xwe di vî şerî de girtin. Fermandar Hawar li gor şer bi tedbîr tevdigere û rêhevalên xwe bi cih dike. Her hevalek cihê ku têde çeper digre xwe dike sengereke ku qet neyê derbaskirin. Biryardariya Hawar biryardariya taximê ye. Piştî şereke pir dijwar fermandar Hawar birîndar dibe. Dema ku fedayiyên hemdemî dibînin ku fermandar Hawar birîndar dibe, dev ji berxwedaniya xwe û rêhevalên xwe bernadin, yekser fedayî Denîz fermandariyê hildigre li ser milê xwe û li gor rêveçûna şer, bi taxima xwe re şer dike. Dema ku şer dijwar dibe û edî cihê ku lê senger girtine tangav dibe fermandar Denîz yekser van gotinên xwe dawî a dîrokî bilêv dike.

### Gotinên dawî yê Fermandar Denîz Çiya

"Di van kêliyan de dijminê ku bi feraseta cîhadîst ku ji bo hemû cîhanê û gelên heremê bi taybetî ji bo jinan xeteriyeke mezin ava dikin, derdora me bi tangên mezin dorpeç kirine. Hêjmareke pir zêde çete êrişî me dikin, heya niha me pir awayên cuda, li hemberî wan çalekî pêşxistin lê belê niha em cebilxana ku heyî ji bo neqede bi tedbîr bikartînin. Ji xwe pêwîst e hemû heval û gelê me bizanibin çi dibe bila bibe em ê heya henaseya xwe ya dawî şer bikin. Bangawaziyên teslîmiyetê li me tên kirin, lê çawa ku Zarîfe û Besêyan ji latên Dêrsimê de xwe avêtin, Rindêxanan Pira Malabati de dawiya jiyana xwe anîn û jiyan avakirin, em jî yê tucaran ji berxwedaniyê paş de gav neavêjin. Niha li gel me hemûyan bombeyeke ku me rakirî heye. Ger ku em bizanibin êdî cebilxaneya me dawî bû, em her 5 heval yê bi hev re li hember dijminê dagirker ku her cûre pêkanîn li ser rêheval û gelê me de anîne çalakiya canbexşane pêk bînin. Çi dibe bila bibe, tu tiştê ji parastinê rûmeta gelê me girîngtir nîne. Yên ku demê pêwîst de mirinê nedin ber çavan nikarin bibin henaseya jiyana azad".

### Bi çanda welatparêziya Efrînî mezin bûye

Fermandar Denîz Çiya eslê xwe ji bajarê Efrînê ye, lê li bajarê Şamê ji dayîk dibe. Bi çanda welatparêziyê ya Efrînê mezin bûye. Malbata wê gelek bi nirxên civaka xwe û axa xwe ve girêdayîne. Kesayeta wê bi xweşikbûna Efrîna rengîn tê xemilandin. Hîn di zarokatiya xwe de li ser çanda exlaqî û polîtîk tê mezinkirin. Wek zaroka malê ya tenê bi hezkirinek mezin, tê mezin kirin. Qasî nazerîna xwe, ewqas jî xwedî kesayetekî bandorkere ku derdora wê her civat çêdibin. Xwendevaneke jîr e, li ser sosyolojiya jin û civakê lêhûrbûnên kur dike. Hîn di temenekî biçûk de, rastiya doza gelê Kurd, doza heremê nasdike û xwe bi fikirê Rêber Apo re dike yek.



Bi taybetî êrişên dagirker yên li ser Efrîn, Serêkaniyê, Şehba û Minbicê, di Fermandar Denîz de kîneke mezin dide avakirin. Rêheval Denîz li ser armanca ku bibe jineke azad û pêşengtiyê ji civaka xwe re bike di sala 2024'an de tevlî refên têkoşînê dibe. Di demek zû de bi wate dibe û di kêliyên mezin de xwe avadike. Jin, xweza û gerdûn li gel heval Denîz di nava hevsengiyekê de dibe zimanê jiyanê. Ji bo vê jî jiyana ku Rêber Apo avakiriye pir jê bandor dibe û hezdike. Dixwaze seknekî sosyalîst di xwe de avabike ku bibe bersiv ji hemû pirsgirekên di heremê û Rojhilata Navîn de tên jiyankirin.

### Ji Cenazeya jina Kurd ditirsin

Piştî ku fermandar Denîz pêşengtiyê dike û çalakiya fedayî dike, fermandar Hawar, Rojbîn, Dilbirîn û Feraşîn çalekiya xwe ya fedayî di dîroka 10'ê Çileya 2026'an pêktinin. Çeteyên dagirker li beramberî cenazeyên şehîdên me gelek pêkanînên dermirovî dikin. Dixwazin bi van pêkanînên dermirovî dîroka têkoşîna gelê Kurd, îradeya hevalan li beramberî gelek têkoşerên dîl hatine girtin û şehîd ketine de gelek mînakên wê hatine jiyankirin, rûmeta gelê Kurd û gelên heremê bişkînin. Ji xwe dema ku dibînin ya ku pêşengtiya vî şerê bêhempa dike wek jinek serhildêr Denîz Çiya ye û bi rojane ku nahêle dibin fermandariya wê de 2 taxên biçûk bikevin destê vî dijminê xwînxwar, bi hêrsekî ku tu exlaqekî mirovî nasnake pêkanînên dermirovî dikin û fermandar Denîz li mala ku çalekiya xwe kiriye de ji jor de diavêjin xwarê. Wana xwestin bi vî awayî rûmeta jinek têkoşînvan û gelek têkoşînvanên din bişkînin, bi vê tevgera dijî rêbazê şer û exlaqê şer armanc kirin ku îradeya her jinek Kurd bişkînin û teslîmiyetê li hember hişmendiya wan a qirker serî bitewînin, lê fermandara me bi mirina xwe jiyanek din afirand û bi xwedî derketina ji rûmeta gelê xwe re bersivek mezin da dijmin û xwînxwaran. Ev ji bo her Kurdekî ne bû binkeftin, lê belê bû serkeftin û serfirazî ji her Kurdekî re. Jina Kurd careke din di dîroka cîhanê de navê xwe danî û isbat kir ku jinên Kurd qehreman in û li ber hovîtiya dewletan serî natewînin.

### Nasnameya Fermandar Denîz Çiye wiha ye:

Nav û Paşnavê Kod: Denîz Çiya
Nav û Paşnavê Rast: Zeyneb Kirdelî
Navê Dayik: Emîne
Navê Bav: Emîn
Cîh û Dîroka Şehadetê: 10.01.2026 - Şêx Meqsûd/Heleb

**Akademiya Jîneolojî**

## Çanda qesrê û jina malê

**İsyan Karadeniz**

Bi avabûna dewlet û desthilatdariya mêran ve çanda xwedawendîtî bi destê rahiban ve rastê êrişan tê. Perestgehên xwedawendan dibe cihê mala taybet, mala xanedan, mala gund- gundî; aliyekî din de ji dibe kilise, mizgeft an ji hawra yanî cihên olî yên yek xwedayî. Cariyetî û harem wek sîstem; xwe li vir saz dike, di bingeha vê de kolekirina jin heye. Girtina jinan a li qesran an jî malên taybet tê pêşxistin. Bi vê awayî jin ji hev tên veqetandin û nasnameya yekpare tê parçekirin. Jinên rahib ên van deran êdî xizmetê pergala mêrsalar dike, bi vê awayî şikestinek tê jiyankirin. Zewacê pir jinî û şêwaza malbat tên pêşxistin. Kral, rahib û li malê jî mêr û pergala desthilatdariyê tê sazkirin. Her tişt dibe mulkê zilam û xizmeta pergalê wî dike. Jinan ji bo ku xizmeta pergalê mêr bikin li vir tên perwerde kirin û bi tabaqayên jor- elit ve tên zewicandin. Li vir daxwaz ev e ku ev jin bibin ajanên vê pergalê. Belavkirina koleti, desthilatdarî û durxisitina jî nirxên azadiyê ye.

Dest avetîna nirxên civakê bi vê pergalê ve tê pêşxistin. Bi rêya bikaranina nirxên baweriyê ve di hişmendiya civakê tê guhertin. Ji çand û hûnerê, ji ked û laş ve di her aliyê de êriş dibin li ser jinê.

Her çiqasî pergala mêrsalar tê meşandin jî, şopa çanda xwedawend berdewam dike. Di gellek perestgehan de ev şop tê dîtin. Heya berî miladê sedsala 8. jî ji Sumeran, Mitaniyan, imparatoriyên ku çêbune heta serdema Roma jî çanda xwedawend her çiqas şikestî be jî şopên xwe hene. Pagan yek ji wan in.

Di Hititan de rahîbeyên pudihebba ya xwedawend Hepat hene. Her wiha tavanana wek pergalekî hevserokati derdikeve pêş ku bi hevre rêvebirinê destnişan dike. Heya Misrê jî ev çand berdewam dike. Li keleka desthilatdariya mêr; şopên xwe birêxistin kirin û rola xwe listina jinan tê ditin. Piştre di qesran de keybanuya mezin, keybanuya bilind an jî keybanuya dayik ê di Osmanî, Bizans, Misrê de her wiha di Hitit û Mitaniyan de tê ditin. Dema ku kûr dibe qral dayika wî rolek mezin digre destê xwe û li keleka qral dibe xwedî nêrîn û çalakî. Her wiha carna rolên neyinî jî tê listin. Di qesran de gelek listok tê çêkirin û li vir xwe şibandina zilamên desthilatdar û pergala desthilatdariyê jî derdikeve pêş. Tiştên kû ji xwedawendan hatine dizin ji bo sazkirina pergala desthilatdariya mêr hatiye karanin. Qesrên spî yên li ABD, Tirkiye û her wek din ên di rojê îro de ji vê kevneşopiyê tê. Wateya vê destavetina çanda xwedanwend û rêveberti ya wê ve avakirina pergalekî li diji azadiyê û berovaji kirina rastiyan e. Di şopên etimoloji heya malên ku hatine avakirin de ev dizîn şenber tê ditin.

Nasnameya jin ku hatî perçe kirin biyanîbunê ji xwe, qutbuna ji civakê û xizmet kirina pergalê heyî bi xwe re tîne. Jinên ku di vê pêvajoyê de berxwedidin jî nagehêje rêxistinbunekî domdar. An şexsi dimîni an jî demki. Di nasnameya jinê qasre heya jina malê de jin êdi dikevin sinorên mal û malbatê, dibin mûlkê zilam. Ev çar divaran de asemayinê em bi kenvaşopiya satî ve bînin ser ziman ka di vê merhalê de çi hatiye serê jinan.



# Îxwan El-Musilmîn şaxê Urdin, Lubnan û Misir ket lîsteya terorê ya Emerîkayê

Wezareta Xezîneya Emerîkayî ragihand ku bi hemahengiya li gel Wezareta Derve wan sê şaxên Îxwan El-Muslimîn xistine lîsteya rêxistinên terorîst û di heman demê de cezayên giran li ser wan ferz kir.

**Lîloz Hisên**

Rêveberiya Serokê Emerîkayê Donald Trump roja Sêşemê (13'ê Çileya 2026'an) sê şaxên Îxwan El- Muslimîn li Rojhilata Navîn wekî "rêxistinên terorîst" bi nav kir û li ser wan û endamên wan ceza fer kir.

Wezareta Xezîneyê û ya derve destnîşan kir ku tedbîrên hatin kirin li dijî şaxên Îxwan El-Musilmîn li Lubnan, Misir û Urdin, ji ber ku metrsiyên rasterast li ser Emerîkayê û berjewendiyê wê dike. Wezareta Derve şaxê Lubnanê wekî "rêxistineke terorîst a biyanî" raghand, ku ev destnîşankirina herî giran e û dabînkirina piştgiriya madî ji bo komê wekî "sûcekî" bi nav kir. Di heman çarçoveyê de Wezareta Xezîneya Emerîkayê şaxê Îxwan El-Musilmîn li Urdin û Misir wekî "rêxistinên terorîst ên cîhanî" bi nav kir ji ber piştgîrkirina wan ji bo Tevgera Hemasê.

Tê zanîn ku Tevgera Hamas rêxistineke çekdarî ya Îslamî ya Filistînî ye, ku li Elmaniya, Yekîtiya Ewropî, Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê û welatên din wekî rêxistineke terorîst tê sinifandin. Ev kom li gelek welatan qedexe ye, di nav wan de Îmaratên Erebî, Erebistana Siûdî û Urdin.

### Dibe ku ev biryar hin welatan kêfxweş bike û yên din na

Wezîrê Derve yê Emerîkayê Marco Rubio di daxuyaniyekê de got ku destnîşankirinên nû "Gavên yekem di hewildaneke berdewam de ji bo astengkirina kiryarên tundûtûjî û bêîstîqrariyê ku hemû şaxên Îxwan El-Muslimîn pêk tînin her deverê, tê nîşan dan. Lê zêde kir; ku Dewletên Yekbûyî wê hemû amûrên bedrest bi kar bîne ji bo ku van şaxan bê par bike ji çavkaniyên ku dihêle ew beşdarî terorê bibe anî piştgiriya wê bike.

Rojnameya Washington Post ragihand ku Rubio û Wezîrê Xezîneyê Scott Bisent sala borî, li gorî fermana rêveberiyê ya ku ji hêla Trump ve hatî îmzekirin, bi destnîşankirina rêbazên herî guncaw ji bo sepandina cezayan li ser van koman hatine erkdarkirin, ku desthilatdariya Emerîkî dibêje ku ew di kampanyayên tundûtûjî û bêîstîqrariyê de ku zirarê didin Dewletên Yekbûyî û herêmên din, beşdar in an jî piştgirî didin wan. Rojnameyê ji Nathan Brown, profesorê zanistên siyasî û karûbarên navneteweyî li Zanîngeha George Washington, got ku hin hevalbendên Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê, di nav de Îmarat û Misir dê ji vê destnîşankirinê kêfxweş bibin. Wî zêde kir ku ji bo hikûmetên din ên ku kom tê de tê qebûl kirin, ev yek dê di têkiliyên dualî de bibe asteng, di nav de Qeter û Tirkiyê. Hikûmeta Qeterê jî her têkiliyek bi komê re înkar dike.

Berê, Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê ji destnîşankirina vê komê wekî rêxistineke terorîst dûr xistibû, di helwestekê de ku hate şîrove kirin ku naxwaze têkiliyên xwe bi Tirkiyê re bixe xeteriyê, ji ber meyla Îslamî ya serokê wê Receb Tayîp Erdogan û têkiliyên wî yên îdeolojîk bi Îxwan El-Muslimîn re.

### Misir biryara Emerîkayê pêşwazî dike

Misir bi awayekî lez pêşwaziya biryara Emerîkayê kir, Wezareta wê ya derve di rêya daxuyaniyekê de got; "Komara Misirê ya Ereb raghandina Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê rêxistina Îxwan El-Muslimîn wekî Teroreke cîhanî bi taybet, pêşwazî dike." Di heman demê de wekî gavekê ku xeteriya van koman û îdyolijiya wê ya tundraw destnîşan dike, wesf kir.

### Pêşwazîkirina Îmarat

Ji aliyê xwe ve jî Îmarata Erebî biryara Emerîkayê pêşwazî kir, ji ber hewildanên berdewam û sîstmatîk yên ku rêveberiya Trump pêk tîne, destnîşan dike ku armanc wê ew e ku kiryarên tundûtûjî û bêîstîqrariya ku ji hêla şaxên Îxwan El-Misilmîn ên terorîst ve li her deverê ku ew lê têne dîtin, werin astengkirin.

### Urdin: Ev kom bi salan e bi awayekî yasayî hatiye helandin

Li Emanê, berdevkê hikûmetê Mihemed El-Momanî di daxuyaniyekê de got ku Îxwan El Musilmîn li Urdinê bi salan e bi awayekî qanûnî hatiye helandin, ev yek ji hêla biryara dadgehê ya 2020'an ve hatiye piştrast kirin û hemî çalakiyên wê di Nîsana 2025'an de hatine qedexekirin.

Di Nîsanê de, Urdinê qedexeya hemî çalakiyên Îxwan El-Musilmîn ragihand, nivîsgehên wê girtin, mal û milkên wê desteser kirin, komê bi hebûna çekan, hewldana çêkirina teqemenî û mûşekan û komploya ji bo bêîstîqrarkirina welêt tawanbar kir.

### Rêxistina Îxwan El-Musilmîn li Lubnanê

Cewherê çalakiyên Îxwan El-Musilmîn li Lubnanê ji şaxên din li Misir û Urdinê cuda ye. Li gorî daxuyaniyek ji Wezareta Derve ya Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê, Îxwan El-Musilmîn ên li Lubnanê (ku wekî Koma Îslamî jî tê zanîn) bi Hizbullahê re ji bo avêtina roketan li bakurê Îsraîlê hevrêzî kirine û bi hevrêzî bi Hamasê re jî êrişên din li ser Îsraîlê plan kirine.

Di Tîrmeha 2025'an de, artêşa Lubnanê kampeke perwerdehiya leşkerî ya veşartî hilweşand ku tê de çekdarên Îxwan El-Muslimîn li Lubnanê û Tevgera Hemasê jî hebûn.

### Rêxistina Îxwan El-Musilmîn li Misir

Biryara Emerîkayê ya derbarê Îxwan El-Musilmîn li Misrê de ji aliyê Wezareta Xezîneyê ya Emerîkayê ve hatiye dayîn.

Li gorî daxuyaniya Emerîkî, rêxistina Îxwan El-Musilmîn li Misrê girêdayî Hemasê ye, di rêya piştgiriya kiryarên tundûtûjî û terorê di heman demê de pêşkêşkirina piştgiriyê ji bo çekdarên Hemasê re.

Li gorî daxuyaniyê, di i sala 2024'an de, Îxwan El-Muslimîn li Misirê bûn alîkar di rêxistinkirin û hêsankirina derbasbûna çekdaran ji Xezayê re bi hemahengiya Hemasê.

### Rêxistina Îxwan El-Musilmîn li Urdin

Daxuyaniya Wezareta Xezîneya Emerîkayê destnîşan kir li ser biryara helandina rêxistina Îxwan El-Muslimîn li Urdinê di biryareke dadgehî sala 2020'an de, ku tevî vê yekê jî vê komê karê xwe bi awayekî ne qanûnî li Urdinê berdewam kir.

Li gorî daxuyaniyê hin çekdarên girêdayî rêxistinê çalakiyên terorîst li Urdinê pêk anîn, endamên Îxwan El-Muslimîn mekenîzmeyeke ji bo karê terorî li Urdinê ava kir, bi alîkariya hin aliyên derve, di nav de çêkirina mûşek û teqemeniyan herwiha tevlîkirina endaman di nava rêxostinê de. Endamên li Urdinê û derveyî welat ku girêdayî Rêxistina Îxwan El-Muslimîn in, yên ku bi awayekî fermî hatin hilandin bi berhevkirina pereyan bi rêyên neqanûnî ev kar hêsan kirin.

Di daxuyaniyê de, têkbirina planên terorî ji aliyê endamên girêdayî Îxwan El-Musilmîn ve li Urdinê di Nîsan û Gulana 2025'an de, gavên ku ji aliyê hikûmeta Urdinê ve ji bo qedexekirina tevahiya komê, di nav de sûcdarkirina komê, desteserkirina mal û milkên wê û girtina nivîsgehên wê hatine avêtin, hate nirxandin.



### Encamên destnîşankirinê wiha ne:

Hemû milk û mafên rastîn yên girêdayî wan aliyên ku ketine lîsteya terorê de li Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê, mal û milkên ku ji hêla kesên ku hemwelatîbûna emerîkî hildigrin ve control dikin, têne cemidandin.

Kesên Emerîkî yên ku ceza li wan hatine kirin, beşdarîbûna wan ji bo karên aborî û muameleyên bazirganiyê hatin qedexekirin, di bin lêpirsîneke qanûnî de.

Her kesê ne-Emerîkî ku nûnertiya kesên ku ceza li ser wan hatin danîn, girêdayî van rêxistinan be an jî piştgriya wan ya darayî bike, qedexe ye ku bikeve Dewletên Yekbûyî yên Emerîkayê.

Pêşkêşkirin, hewl dayîna dabînkirinê an komploya ji bo dabînkirina piştgiriya madî ji Îxwan El-Muslimîn re li Lubnanê sûc e.

Her saziyên ku ji sedî 50'î an jî zêdetir bi Îxwan El- Musilmîn ve girêdayî ne, têne cemidandin.

Bersivdayîna Îxwan El-Muslimîn li Misirê

Îxwan El-Muslimîn li Misrê "redkirina xwe ya kategorîk" a biryara Washingtonê ya destnîşankirina wê wekî rêxistineke terorîst nîşan da û tekez kir ku ew dev ji tundûtûjiyê berdide û ji bo Dewletên Yekbûyî ti gefê naxwe.

Di daxuyaniyek elktronîk de ku ji hêla komê ve hatî weşandin, wê îdia kir ku destnîşankirina Emerîkî li ser bingeha ti delîlên qanûnî yên pêbawer nîne û soz da ku hemû tedbîrên qanûnî bigire da ku pêkanîna vê biryarê rawestîne da ku mafên xwe û mafên hemî endamên xwe biparêze.

# ÇIROKÊN ÊŞA OLAN

**Ehmed Goyî**

Xezêm bi dengekî hêdî û tirsonek, gazî min kir:
Edûl, Edûlê?
bi lez here xwe têxe nav qoça daran !!
heta min gazî te nekir derneke ve?
çavê min ji xewê venedibû, min nezanîbû ev dengê
Xezêmê'ye an ez xewna dibînim!!
Ji berku ew heft roj û heft şevbû bi aramî me xew nekiribû.
Dem havîn bu lê dîsa jî şev li çolê serma hebû,
Hêja şewqa tavê nedabû serê Çiyan, Havîna zozanan rojê germ e, lê şevê sar e,
Hem ji serma û hem ji tirsa kuştina xwe
Û ya Zarokên xwe laşê min dilerizî. keça min a yek salî li ber sîngê min ji lêdana dil û lerza
laşê min ji xew cinigî û çavê xwe vekir û girî!!
Girî û her girî
Û destê xwe li pêsîra min gerand ji birça şîr li pistanên min nemabûn bimije!!
lê dîsa ji sebra wê pê dihat.
Min Çiçikê xwe bi lez xiste devê wê de îda neqîre û deng neçe kesên li dora me.
Hingê pêsîra min da ber mirçan serê memikên min werimîn lê mêht û her mêht lê şîr nediçû devê wî, westîya û xewve çû, herdû zarokên min ên dî li ber hembêza Bapîrê xwebûn, bu hêstên zarokatîyê hay ji tiştekê nebûn Lê dema li çavên me ên bêhêvî dinêrin ewan jî hîsdikir ku tiştekî xirab heye. Ew heft roj bu me rê diajot em gihiştbûn herêma Duhokê , çiyayên rêl û daristanan em hembêz kiribûn, Av û xwarina me jî qedîya bu. Gellek pîr û zarok ji tîn û birçan rêde miribûn. Sê kesan jî ji geztina mar û dûvpişkan canê xwe ji dest dabûn. Min birç û êşa laşê xwe jibîr kiribû, ketibûm gomana zilamê xwe hêj 25 salî xortekî qeşeng bu, ew 6 sal bu em zewicîbun, em hêja ji hev têrnebîbûn
Me têr şevên sar germ nekiribûn
Me Ji bîhna hev têr eşq hilnekiribû, awirên wî ên germahî didan dilê min îda nebûn, lewma min sarbû dilerîzîm ji bêevînîyê ji bêxwedîtîyê, ji bêdewletîyê. sehkirina dengê hin mirovên biyanî bi hişyarkirina jinmama Xezêmê herkes bi aliyê daristanê çû, bitirs û bêdeng dimeşîyan min zanî ku ev ne xewn e ez dibînim, dengê Jinmama Xezêmê dîsa hat guhê min keçê ji tere dobêjim zû rabe serxwe. em ji Gundê Gobel, hin jin û zarok û pîremêr ketibûn ser rêyek ne diyar, ger em ji herêma Şingal dûrketiban, belê me nedizanî em kude herin, herkes bi tevî zarokên xwe bi alîyê bakur ve direvîyan , em tev ketin nav teraş û darên qoç guhê me ma ser derdora me, ez ketim nav xewn û xeyalan em ê bi kude herin û kîjan qewm dê me ji hovîtîya îslamê biparêz e , me dizanî
Kurdên bakur jî Misilman in, em ê çawa bawerî bi wan bînin, ev cara heftê û çaran bu misilmanan ferman sermede dianîn , bav û bapîrên me jî ji ber zilma Osmaniyan sala 1890 ji quntara çîyayê Cudî ji warê bavên xwe koçberî herêma Şungalê bîbûn, lê wextê ez zarok aqilê min qebûl nedikir gelo ma qey îslam ne dînekî semawî bu çawa mirovê ji xweda bawerbike mirovan dikuje , me jî hewar dikir Xwedayê hêz û mezin û Melekê Tawis li hewara me wer e, ji dûrve dengê hin mirovan dihat guhê me
Hingî diçû deng nêzîk dibûn, tirsa min gihişt bî astekî zêde 3 zarokên min hebûn ê mezin 5 salî bu, nedikarîn çîyan bimeşin mefera min her xezûrê min bu , temenî wî ji şêstî derbas bîbû dîsa her ew bû xwedanê min arîkarîya min dikir, em gihiştîn daristanê herkes cihê xwede mis bûbû, lê tirsa min ji ya hemû kesê zêdetir bu ji ber ku ez hêj pirr ciwan bûm, gewr û bedew bûm wek heçku bavê min dizanî ezê bilind û xweşik bim wekî Edûlê navê Edûla ZorTemer paşayê Milan li min kiribû ew 6 sal bû ez zewicî bum ez û zilamê xwe evîndarî hevbûn, min dizanî Misilman Jinên ciwan ji xwere dikirin carîye an jî bi peran diforotin pîr e kalên Ereban her ew tirs li bîra min bu lewma min kêrekî mezin kiribû çenteyê xwede
Heger ez bibînim ez ê dîl bêm girtin da ez xwe bikujim , ji ber ez nekevim destê erebên gemar min zûde biryara xwekuştina dabû, deng ji kesê nederdiket an min ji lêdana dilê xwe dengê kesê sehnekir , qederekê em wilo man sekinî, piştre nalîna jinekê li nav komên li pey me bilind bû, jineke pîr ji tîn û birçan nedikarî bimeşe,tu hal û taqeta wê nemabû, mêrê wê li ber serê wê rûniştibû û digirî, em hemû hêstîyar bûn û bêdeng digirîn bêçaretî çavê me hemûyan de xwiya bu, piştê nîv seetê Jina pîr canê xwe teslîmê Yezdan kiribû , me nedikarî mirîyên xwe bingor bikîn me gelek term li paş xwe hişt bûn, laşê wan bu xwarina teyr û lawirên dirinde
Ew dengê dora me her diçû nêzîkî me dibûn û ew kesên em ji dengê wan ditirsîyan em dîtibûn, û gazîyê me dikirîn, hevalno netirsin em Hêzên Paristina Gelin em Partiya Jarketin Kurdistan in. em li hewara we hatîn e , aram bibin ji me netirsin, me nan û av ji were anîye, em tev şaş mabûn, me Êzdîyan hêza pêşmerge nasdikrin û hêza kurdan didîtin ewan jî terka me kiribû, gelo ev kî ne? ewil me bawernekir , me bersiv nedan wan carek dî dîsa gazî me kirin , vê carê dengê Jinekê hat guhê me Jina gazî dike kurmancîyek xweş û safî xeberdida got em ji ber paistina we ji Qendîlê hatin e, navê min Awesta ye ji me netirsin me ji were xwarin û av anîye, vê carê me hemûyan baldarî gohtinên wî jinê guhdar kiribû, ji dengê jinê û bo navê wî Awesta em hinek aram bibûn xeberdana wê li me xweş hatibû , bandorakî bi bawerî li ser me hemûyan kiribû, deng û navê wî hêstekî Netewî li rûhê me hişyar kiribû, xeberdan û devoka wan gelekî li me xweş hat, aramî da bû me teva, Hem dengê Awesta he jî derketina rojê laşê me germ dikir. Awesta bi bêtêla xwe gazî hevalê xwe dikir Zerdeşt Zerdeşt guhdar be em gihistîn cem hin xwişk û birayên xwe, navê wan Zerdeş û Awesta ji mere digotin xwişk û bira serê me tevlihev bîbû, gelo ev kîjan hêz in me navê tevgerekê li bakur sehkirbu li himberê Tirkiye têkoşîn dikin lê me ji nexwest bû em wan ji nêzîk ve nasbikîn û têkilîyê bi wan re dênîn, pirr caran zilamên me behs dikirin digotin hin xort û Keçên çekdar hatine vî çiyayê me, dixwazin bi mere têkilîyê pêkbînîn dibêjin em (Partiya karkerên Kurdistanîn) lê me nedixwest em wan nasbikîn ji ber ku me digot misilman hemû eynî ne neyarê Êzdîyatîyê ne, lê gelo heger ev mirovane ji gelê Êzdî hiznekiriban ê navê xwe Zerdeş û Awesta danîban ?? Gohtinên wan ên xwişk û biratî hêstên me hatin guherîn , lê roja rehetiyê gotinên wan li ba me cihnegirtbu, me guh nedabû wan,
Dîsa jî wan ji bo wê helwesta me a şaş û xelet terka me nekiribûn, em bi tenê nehiştîbûn, hewara me êzdîyan hatibûn, rondik dilop bi dilop ji çavên xezûrê min diketin erdê, û ji nav lêvên wî ev gotin derdiketin , digot Ey Yezdan ê dilovan we dengê me sehkir duayên me qebûl kirin wa hêza Zerdeştê Kal hewara me hat, aramî bi dilê me ket, me tev êş û jan û xema xwe ji bîr kir, Awesta û hevalên xwe gihistin cem me , em hemû yek bi yek hembêzkirin û em hêstîyarbûn rondik ji çavên me hemûyan rijîn ser axa pîroz.



## Em li vîna azad xwedî derbikevin

**Gulîstan Xalid**

Di şerê li şêxmeqsûdê de me dît ku çeteyan çawa bedena jineke ciwan ji ciheke bilind davêjin. Ev dîmen ewê tu cara jibîra me neçe, jiber rastiya hêrsa hişmendiya mêrperest ya ku bi tu awayî qebûl nake jineke ku têkoşer û azad bibe, di şexsê van çeteyên herî hov de me careke din dît.
Ev hişmendiya ku îro bûye belaya serê mirovatiyê bi destê desthilatdarê ku di bin qilefeke moderníteya sexte de tê bi rêxistin kirin û ji bo ku ew modernîstên sexte rastiya xwe eşkere nekin van çeteyan bi ser civakên ku li hemberî sistemên koledar ve têdikoşin, didehfînin. Rastiya êrîşên li şêxmeqsûd ji me re gelek rastiyan radixîne berçavan. Rastiya ku em di serdemeke çawa de jiyan dikin û ev serdem çawa weke berdewamiya sistemeke ku pênc hezar sal zêdetir mirovatî xistiye nava pencên xwe û ji bo ku vê mirovatiyê biperçiqînin her car bi maskeyeke cûda mirovatiyê di nava lepê xwe de diperpitînin.
Em dîrok zana, rexne dikin ku bi xwe jî gelek caran bi vî sistemî xapiyane û weke guhertin û pêşketineke sistema raxistine berçavên me. Gotin sistemê koledar, piştre gotin feodal, piştre gotin sermayedar û sosyalîzim. Lê di rastiya xwe de ev sistem di şekil de xwe dugherîne, lê di hişmendî de heman sistemê koledare. An jî sistemê dewleta yerarşîk, ya rahib û qiralane. Rahibên ku li ser navê xweda diaxivin û qiralên ku ji bo berjewendiyên xwe yê li ser hukum mayînê bi ya gotinên rahiban dikin.
Ev sistemê ku ji destpêkê de bi sitratjiya perçiqandina jin ve xwe bi rêxistin kir, bi perçiqandina jin re dizanî ku ewê bikaribe hemû civakê li gorî xwe şekil bide û ji bo berjewendiyên xwe yê qezencê bikar bînin. Ger ku gotin dîrok ji tekerurê îbarete tê gotin, jiber vê rastiyê ye. Ger ku em dawî li vî sistemî neynin ewê hîna gelek dîmenên ku li dil û mejiyê mirovatiyê dixe bîne ber çavên me.
Êdî dem ne dema duruşmeyane, ne dema ku tenê em li kolanan qîr bikin, piştî her dîmeneke bi êş li her cihî xwepêşandan çê dibe, elbette ev jî bi watene, lê têrê nake, li hemberî vî sistemê xwînmij yê ku tenê bi rijandina xwînê xwe ser piyan dikgre, ev sistemê ku nemrûdan, ferûnan, dehakan nûjen dike pêwîste ku li hemberî wî li her aliyê cîhanê eniya mirovatiya ku ji bo hesabên vî sistemî qûrbanî daye xwe bi rêxistin bike û bi yek enî têkeve şerê parastina rûmet û hebûna xwe ya azad.
Gereke herkes êdî vê rastiyê bibîne ku xeteriya vî sistemî her kesî tehdîd dike, ne tenê civakên mirovan, cîhana ku em lê jiyan dikin bi hemû hebûnên xwe ve di bin tehdîdê de ye. Ev sistem her der wêran û talan dike, mirovên ku di bedena xwe de nayên kuştin jî di mejî û rihên xwe de têne pûç kirin.
Mirovatiya ku di mejî û rihê xwe de ne azad be, tu wateya hebûna wî ya fîzîkî jî namîne, tenê weke miriyê zindî dibe. Çav heye lê nabîne, guh heye lê nabhîse, mejî heye lê naxebite. Ger hebûneke mirov hebe û azad nebe, bedena ku organên wê bi fonkisyon nebe tenê ji bo xwe û hawirdora xwe dibe bar. Ji lewma li her derê gereke em şerê vî sistemî bikin û li hebûna azad xwedî derbikevin.

# Li Sûriyê qeyrana gelan û bêdengiya cîhanê

**Egît Jiyan**

Hêzên desthilatdar ji bo berjewendiyên xwe pêk bînin gelan dikin qurbaniya bazara xwe ya qirej. Mirovatî li ber lingan çûye ne xema kesekî ye, tenê ji bo wan berjewandîyên wan ê takakesî bese. Li ser vê hişmendiya qirej gelê xwe jî dikin qurbana berjewendîyên xwe. Îro roj qeyranek pir giran ser tevahiya gelên Surîyê tê meşandin. Taybet dema mijar dibe gelên azadîxwaz û demoktatîk cîhan xwe bêdeng dike.
Îro li Suriyê qeyranek û pisgirêka azadiya gelan bi dijwar derdikeve ser dika cîhanê. Hemberê wê dijwariyê daxweza azadiya gelan hişmendiya zilamê desthilatdar dewletparêz wekî ku çareserî nîne, tenê zihniyetek heye ew jî şer, talan, komkujî û guhertîna demografîyê wekî ku tiştekî din nîne dide meşandin. Dema zihniyet û feraset bi vî şeklî be, şer û pevçûn hertim derdikeve pêşiya me û di encam de kerasetekî mîrovî derdikeve pêşiya me.
Çareseriya qeyrana civakî ya ku bi pençe qirkirinê re rû bu rû ma ye, azadiya gelan ancax bi paradigmaya Rêber Apo ku dide diyarkirin bi civaka exlaqî, polîtîk, ekolojîk, demokratîk, azadiya xwaziya jin dikare pêk were. Lê hişmendiya dewletparêz dij azadiya xweziya jinê ye. Ji ber wê jî hişmendiya ku jin wek îrade nabîne ne dikare ekolojîk be ne jî dikare demokratîk be. Ev hişmendiya dewletparêz, nijadperest, cihadîst wê tene wek talanker, qirkerê hov were binavkirin.
Hemberê netew û baweriya gelan, gelê Elewî û Durzî û taybetî li ser gelê Kurd komkujiyên pir dijwar tên meşandin, çeteyên ku digotin me Suriyê ji desthilatekî bi salan e rizgar kir. Mixabin ev qaşo Hûkumeta niha ti ferqa xwe ji yên berya xwe nîne û zihniyet û ferasetа xwe hîn xiraptir e, desthilatdareke hov û nîjadperest e. Kurdên ku bi sala li hemberê her cure êrîşan parastina xwe kirine û ti caran nehîştine ku bostek ax tekeve deste wan çeteyan, îro roj bi planek qirej qetlîyamek li ser gelê me yê berxwedêr û wek navê xwe Kelha Berxwedanê ye Şêx Meqsud û Eşrefîyê hate meşandin. Di destpêka êrîşan û heya dawî wek navê xwe hem gel û şervanên me li ber xwe dan û xwe feda kirin. Ji bo rûmet û keremata hebûna gelê Kurd. Hemberê berxwedanek wisa ku mirov rastî nikare ti pênaseya wî bike wek her care cîhan xwe ker û lal kir.
Şervan û zarokên wê axê gelê kurd hember her cure êrîşên xwe kirin mertalê zîndî û xwedî gelê xwe derketin û hemberê cîhana ku xwe bedeng kirîye gotin ku ;“Em telsîm nabin û emê heya dawî li ber xwe bîdin!!!”.
Ruxmê ku zanîbun derveyê canê xwe fedakirinê tiştekî din nîne. Gelo di kîjan dîroka gelan de girêdaniyek wisa hatîye jîyankirin ku gel û şervan bibin yek?
Belê tenê gelê ku ewqas êş kişandi be dikare ev berxwedaniya dîrokî raber bike. Li beramberê hişmendiya qirker bi serbilindî u canbexşane xwe fedayî azadiya gelê xwe dikin, ji neyarên xwe çong natevînin.



# Hêzên hegemon û Rojhilata Navîn

Li Rojhilata Navîn hêzên hegemonîk yên cîhanî û herêmî ji bo parastina berjewendiyên xwe planên xwe yê stratejîk dewam dikin. Li ser rijandina xwîna gelan polîtîkayên xwe didin meşandin û nirxê mirovahiyê bin pê dikin.

**Viyan Egîd/Qamişlo**



Jêderka mirovahiyê Rojhilata Navîn, wek tê zanîn ku herdem bûye navenda hêzên herêmî û kadî. Ev der ji ber hevbirîn a ol, nîjad, kom û çanda ye her dem bûye cihê şer û dijberî yê. Ev der li dû şerê împeryal şerê cîhanê yekem de bi têk çûyîna qayserîyan Romê bi dest dewletên împeryal hatin parvekirin û sînor li gorî berjewendiyên xwe danîn. Bi gelemperî sînorên em tê de dijîn hatine avakirin. Lê bi taybetî bi lihevkirina Lozan û Sykes-Pîcot ê ev herêm hate tevlîhevkirin û bingeha şerên bê dawî hatê avakirin.
Hegemonên kadî( DYA, Rûsya, Çîn) ê heremî (Tirkiyê, Îsraîl, Îran) di heman demê de çi stratejiya pêk tîne û bandora stratejîyên wa li ser pirsgirêka Kurdan çi ne? Ji bilî vê yekê ev şerên hegemonî li rojhilatê navîn wê çi pêşerojê û çi rêçê veke?

### Şerê cîhanê yê 2`emîn de

Bi destpêkirina şerên 2`emîn ê cîhanê li Rojhilata Navîn gelek dewletên mêtîngehî serbixwe bû. Di dema şerê sar de ev dewlet di bin bandora her dû dewletên hegemonî de mane. Lewma hegemonî yên herêmî wek Îran, Îsraîl, Tirkiyê, Erebîstana Seûdî projeyên xwe hemû li gor van hegemonên mezintir diafirand û amadekariyên wana dikir.
Di sedsala 21`an de bandora hêzên herêmî û kadî li Rojhilata Navîn perisî ye. Di salan 2011`an de bi destpêkirina “Biharan Erebî” rejîmên otorîter têk çûn. Li Lîbya, Sûrîyê û Yemen ê şerên navxweyî destpêkir. Bi mezinbûna vî şerî hemû hezên kadî wek gurê har êrişên herêmê kir. Bi taybetî şerên Sûriyê di vê mînakê de ji ber ku hebûna hemû hêzên kadî û herêmî bûye wek texteye kî kişik e (Setrenc). Vê rewşa avayî yan jeopolîtîk a Rojhilata Navîn qurfbartir kirîye. Di 7`ê Cotmehan 2023`an de êrîşa Hamas ya li dijê Îsraîlê û piştre êrîşa Îsraîlê bi firewanî li ser Xezayê ev qurfbarî kûrtir kir. Serok wezîr ê Îsraîlê Binyamin Netanyahu got: “Ev 11 Îlona Îsraîlê ye.” Li dû vê gotin ê, êrîşê ser Xezayê kir û hevsengiyê Rojhilatê Navîn ser û bin kir. Îsraîlê bi tenê êrişê Hamas nekir. Lê belê erişê Hîzbûllahên Lîbyayê, Îran û Sûrîyê jî kir. Ev êrîşa Îsraîlê gihîşta asta ku herêm tevde da be şikandin nav şerekî mezintirîn. Di heman demê de li Sûrîyê bi pilana dewletên navnetewyî ku digotin HTŞ`ê rejîma Esed têk bir, lê ya rastî pilanek bû û li ser erdê pêk anîn. Bi vê bûyerê derî li demek nû yan hevsengî yan herêmê vekir. Ji bilî vê yakê bandora veguherînen herêmê li ser pirsgirêka Kurdan jî zêdetir krîtîk bû.

### Li Rojhilata Navîn polîtîkayên DYA yê: Ewlehyî, Enerjî û Tekîlîyên Îsraîlê

Wek tê zanîn ku ji sedsala 20`an û pêde DYA`yê eleqedariya xwe yên di Rojhilata Navîn de zêdetir kirîye û di dema şerê sar de li ser hevsengiyên ewlehi yan herêmê bi bandor bûye. Polîtîkayên DYA`yê ku Rojhilata Navîn li ser parastina sîstema ya heremê, ewlehiya çavkaniyên xweristî bi avayekî stratejîk û bi piştgirî ya Îsrail ê bilind dibe.
Amerîkayê ji êrişa 11 Îlona salan 2001`an de û virde bandorîyan xwe li Rojhilata Navîn zêdetir kir. Di heman demê de mudaxaleya leşkerî him li Iraq ê him jî li Afganistan ê kir. Bi van mudaxaleya Rojhilata Navîn ket bi bandora DYA`yê de. Şerê Iraq`ê ne bi tenê ewlehiya Rojhilata Navîn e, di heman demê de hevsengî yan hêzên herêmî jî veguherandî ye. Wek bi mudaxaleya, Îranê jî li herêmê ji alî leşkerî ve tesîra xwe zêdetir kirîye û li hember DYA`yê bûye xetereke stratejîk. Di van çend salên nêz de DYA`yê stratejiyên xwê guhert û ji herêmê mînak Afganistan ê cihê ku hêzên wê yên leşkerî lê hene paşve kişîya. Trump ji bo berjewendîyên Amerîkayê ev stratejî bikaranî û bi vê stratejiyê hêzên herêmî jî veguherandin. Lê li ser êrişan Hamas, DYA dîsa mecbûr ma ku tevlî pirsgirêka Rojhilata Navîn bibe. Her wiha peymana wê yên li Rojhilata Navîn bi dewletên wek Îsraîlê, Tirkiyê, Erebîstan a Seûdî re hegemonî yan wê li hemberê Rûsya û Çînê dest xurt dike.

### Li Rojhilata Navîn polîtîkayên Rûsa yê

Li dû têk çûna Yekitîya Sovyet an, Rûsyayê li Rojhilata Navîn bandora xwe winda kir. Lê di sala 2000`î de bi rêveberî yan Putîn ji bo tesîre xwe dîsa mezintir bike stratejî pêk anîne. Armanca Rûsya yê li hemberê hegemoniyên kadî a DYA`yê li cîhanê bibe hevseng û çavkaniyên xweristî an enerjîyê bi parêze.
Di sala 2011`an de tevlîbûna şerên navxweyî yê Sûrîyê û piştgirîya Esed kir. Ev gav û tekîlîyên wê yên bi Îranê re li Rojhilata Navîn bandora Rûsyayê dîsa çêbû. Her wiha di sala 2022`an de bi destpêkirina şerên Ûkranya yê hêz û dên a wê yan li ser Rojhilata Navîn qels kirîye. Lê dîsa jî Rûsya tekîlîyên xwe yê Rojhilata Navîn didomî û ji bo dewletên herêmî li hemberî DYAyê rola xwe yan alternatîf ê parastî ye.

### Li Rojhilata Navîn Polîtîkayên Çîn ê

Çîn li Rojhilata Navîn stratejî yên xwe li gor aborî û binesazî yê ava dike. Lewma têkiliyên Çîn ê ne wek Rûsya û DYA yê ne. Çîn armanca wêna yekem li Rojhilata Navîn wek cihekî hêzan xwe yan kadî yên aborî biperisîne mêze dike. Projeyan wê ya ku bi navê “ rê û quşak” li gor van stratejîyê wê pêk hatîye. Rojhilata Navîn di navbera Çîn û Ewropayê de wek pire kê ye. Armanca wê wek me li jor got ne leşkerî û polîtîk e armanca wê bi gelemperî aborî ye. Çîn ê li herêmê bi hilberînerên enerjiyê re peymanên dirêjtir îmze kirin e. Lê çiqas armanca Çîne ne leşkerî û polîtîk be jî ji bo berjewendîyên aborî dixwaze ku li vir bi quwet be. Hebûna Çîn ê ji bo herêmê bû ye rêç û alternatîfek nû.

### Hegemoniyên Herêmî: Tirkiyê, Îran û Îsraîl

Rojhilata Navîn çiqas bi bandora hegemonên kadî teşe bigre jî lê li herêmê jî hinek dewlet dixwazin ku hegemoniya xwe ava bikin. Li Rojhilata Navîn em dikarin Îsraîl, Tirkiyê û Îran ê mînak bidin. Ev hersê dewlet jî dixwaze ku li herêmê peyvên wê bê guhdarkirin û wek rêberên dewletên din bê qebûlkirin.

### Li Rojhilata Navîn polîtîkayên Tirkiyê

Tirkiyê dinav dewletên li herêmê de ji hêza herî xurttir yek e. Stratejî û polîtîkayên Tirkiye ji ber ku pirsgirêka Kurd li gor vê pirsgirêkê teşe digire. Lewma stratejî xwe li ser ewlehiyê û aborî dimeşînin.
Tirkiyê him ji ber ku pozîsyona xwe yan jeopolîtîk û him ji endamên NATO`yê ye her tim bi dewletên Rojava yên Cîhanê re têkildar bûye. Lê van çend salên dawîn de ji ber ku bandoriya xwe li Rojhilata Navîn zêdetir bike polîtîkayên xwe guhertin û biryarê serbixwe girtin. Tirkiyê ji ber ku dinav xwe de pirsgirêka Kurdan çareser nekir, naxwaze li Rojhilat û Bakurê Sûriyê jî Kurd bibin xwedî statû û li hemberî wan şer û hereketa dimeşîne.
Tirkiyê daxwaze ku li Rojhilata Navîn roleke serokatiyê bi dest xwe bixe. Lewma dema Bihara Erebî de mudaxaleyên Lîbya, Yemen, Sûriyê û Misir ê kir û tevlê pêvajoyên sîyasî bû. Tirkiyê dixwaze ku dinav têkiliyên Rojava cîhanê û bandorî ya xwe ya Rojhilata Navîn de hevsengîyekê çê bike. Lê ji ber ku polîtîka û stratejîyên wê li ser dijî Kurdan pêk tên dem dem têkiliyên wê bi Rojavayê cîhanê re qut dibin.

### Li Rojhilata Navîn polîtîkayên Îranê

Îran li Rojhilata Navîn xwediyê hêzeke giring e. Him dixwaz e li cihê ku hejmara Şîîan zêdetir e bi bandor bibe him jî dixwaze hegemoniya ku herêmî ava bike. Polîtîka û stratejîyên xwe li ser van herdû xalan pêk tîne. Îran ji bo parastina berjewendîyên xwe li Rojhilata Navîn dixwaze tesîra DYA`yê bişkîne. Lewma li Rojhilata Navîn hêzen leşkerî, aborî û dîplomatîk bikartîne. Her wih Stratejîyan wê yên herî giringtîr “Heyva Şîî” ye. Bi vê armancê Îran dixwaze ku him li Rojavayê Asyayê him jî li Rojhilata Navîn hegemonî yan xwe xurttir bike. Bikaranîna wê yan şerkarên wek hîzbûllah û milîsên Iraqê li herêmê bandora wê zêde dike û li hemberî tifaqa Erebîstan a Sûûdî û Îsraîlê wek alternatîfeke pêşte derdikeve. Bi piştgiriya Esed ya ku di şerê navxweyî yên Sûrîyê de ev armanca xweya herêmî di bin van stratejîyan de anî cih.

# ‘Pêwîst e şertên demokratîk pêk werin’

Parlementera DEM Partî Newroz Uysal diyar kir ku ji bo serxistina pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk ji aliyê DEM partî ve gelek xebat tên meşandin û wiha got: “Pêwîst e şertên demokratîk pêk werin.”

**Dîlan Mulhim\Qamişlo**

Rêber Apo di 27ê Sibata 2025’an de banga Aştî û Civaka Demokratîk kir. Bi vê banga pêvajoya çareseriya pirsgirêka Kurd ku li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyeyê dest pê kir, derbasî pêvajoyeke nû bû. Piştî banga Rêber Apo ji aliyê Tevgera Azadiyê ve jî gavên dîrokî hatin avêtin. Li Meclîsa Tirkiyê jî Komîsyona Demokrasî, Xwîşk, Biratî û Hevgirtina Mîllî ava bû û xebatên komîsyonê bi amadekirina metneke hevpar a raporên partiyên siyasî re didome.



### Banga Aştî û Civaka Demokratîk

Rêber Apo piştî berxwedana 27 salan banga Aşîtî û Civaka Demokratîk kir. Lê belê vê bangê di Rojhilata Navîn û cîhanê de deng veda û bi riya vê bangê gelek guhertin, veguhertin li ser asta Rojhilata Navîn û cîhanê hatin kirin. Herwiha li ser daxwaza Rêber Apo Partiya Karkerê Kurdistan PKK’ê kongira xwe li darxist û dest ji têkoşîna çekdarî berda, xwe fesix kir û hêzên xwe ji Tirkî û Bakurê Kurdistanê vekişandin. Peyamên Rêber Apo di asta navdewletî bi kelêcaneke mezin hatin pêşwazîkirin.

### Kongreya fesixkirinê û şewitandina çekan

Li ser daxwaza banga Rêber Apo, Partiya Karkerê Kurdistan PKK’ê di navbera 5 û 7’ê GulanA 2025’an de li du cihên cuda yên li Qadên Parastina Medyayê, bi tevlibûna 232 delegeyên ve 12 emîn Kongreya xwe li dar xist û biryara xwefesixkirinê girt. Ev biryar ji bo avakirina derfetên aştiyê neteweyî û navneteweyî wek geşedaneke dîrokî û fersendeke mezin hat nirxandin. Gelek dewlet li pey hev peyamên piştgiriyê dan û xwestin Tirkiye van derfetan ji bo çareseriyê baş binirxîne.

### Avakirina Komîsyonê

Piştî biryar fesixkirina PKK’ê û şewitandina çekan, ji bo xebatên qanûnî amade bike û raya giştî agahdar bike di 5’ê Tebaxa 2025’an partiyên ku komên wan di Meclisê de hene Komîsyona Meclisê ava kirin. Komîsyon di civîna xwe ya ewilê de navê “Komîsyona Demokrasî, Xwişk-Biratî û Hevgirtina Mîlî” li xwe kir û li ser 12 xalên bingeha xebata xwe diyar kirin, li hev kirin. Ev yek ji bo pêvajoyê wek qonaxeke qanûnî hat diyarkirin û civakê bi rêjeyeke mezin piştgirî da pêvajoyê. Komîsyon piştî civîna ewil wezîrên parastin, karên hundirîn û sîxurtiyê guhdar kir bi dorê sazî û dezgehên malbatên leşker û polîsên di pêvajoya şer de jiyana xwe ji dest dane, saziyên pîşesaziyê, saziyên bazirganan, Dayikên Aştiyê, saziyên malbatên gerîlayên di pêvajoya şer de jiyana xwe ji dest dane, saziyên girt û hikûmxwaran, saziyên çand û ziman, akademîsyen, saziyên sivîl ên civakî, hunermend û gelek derdorên cuda yên ji ber şer û pevçûnan mexdur bûne, çavdêriyên wan çêbûne guhdar kirin.

Li meclisê avabûna Komîsyona Demokrasî, xwişk, Biratî û Piştevaniya Mîllî gaveke girîng e. Di navê xwe de Kurd nebe jî her kes zane ku ev komîsyon têkildarî pirsgirêka Kurd e. Ji xwe komîsyonê hevdîtin bi gelek sazî û kesan re kir, di van hevdîtinan de li ser pirsgirêka Kurd û çareseriya wê nirxandin hatin kirin. Ji ber ku pirsgirêk gelekî girîng e bang li serokên meclîsê jî hate kirin û di mijara bêdengbûna çekan û pirsgirêka Kurd nêrîna xwe gotin. Axaftinên serokên meclîsê yên li ser mijara pirsgirêka Kurd bi giştî erênî bûn. Bi kurtasî avabûna komîsyoneke bi vî rengî li meclîsê ji bo pirsgirêka Kurd, mijareke ku ji aliyê siyasî ve qîmetê xwe heye. Hebûna pirsgirêka Kurd ji aliyê meclîsê ve hatiye piştrastkirin. Astengkirina axaftina bi Kurdî ya Dayikên Kurd ji aliyê rojevkirina pirsgirêkê ve pêvajo gihand astekê. Serokê meclîsê ji bo rewşa ku derkete holê binixumîne çû Amedê û bi Kurdî axivî.

### Pêvejoya Aştî û Civaka Demokratîk bingeheke ji bo çareseriya pirsgirêka gelê Kurd

Banga dîrokî ya Aştî û Civaka Demokratîk a ku Rêber Abdullah Ocalan di 27’ê Sibatê de diyar kir ne bangeke bû ku tenê li ser pirsgirêka Kurd hat avakirin. Her çend hat diyar kir ku çareseriya pirsgirêka Kurd bi rêya lihevhatinê mimkun e jî, israr kir ku ev tenê bi rêya demokratîkbûnê pêk tê. Bi gotineke din, ev pêvajoyek e ku hemû dînamîkên civakê dihewîne. Avakirina aştiyê jî dikare bi avakirina civakeke demokratîk re paralel pêk were. Ji ber vê yekê, di civakîkirina aştiyê de berpirsyariya hemû gel, rêxistinên civaka sivîl, hemû kirdeyên siyasî, hemû jin û hwd heye. Ev berpirsiyariyeke gelekî cidî ye, avakirina zimanê aştiyê dê nîşaneya niyet û vîna tevahiya civakê be. Lê belê ne tenê gelê Kurd, divê Tirk, Ereb, Ermenî, Çerkes, Asûrî û hemû gelên kevnar ên van axan jî dengê xwe ji bo aştî û çareseriyeke demokratîk bilind bikin. Pêwîst e êdî tenê wek temaşevan nebin, divê wekî kirdeyên çalak di pêşvebirina pêvajoyê de rolekê bigirin ser xwe.

Cewhera aştiyê di kesayetiya Rêber Apo de cih digire. Hem bi gavên pratîkî ku wî di vî warî de avêtiye û hem jî bi pêşniyarên wî yên ji bo projeyên azadiyê, wekî felsefeya azadiya jinan û felsefeya konfederalîzma demokratîk ku îro li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê têne bicîhanîn. Van projeyan di mîsogerkirina mafên hemû pêkhateyan di şoreşa gel de û di peydakirina çareseriyên berfireh ji bo aliyên cûda yên jiyanê, hem di navbera civakan de û hem jî di navbera dewletan de, bi ser ketine.

### Nêzîkatiya dewleta Tirk

Ji banga Rêber Apo dewleta Tirk tu gavên berbiçav neavêtin e. Kurtasî, heke em li ser aliyên ku şer dikin behsa lihevhatinê bikin, em ji wan aliyan hêvî tên kirin ku gavên berbiçav biavêjin. Partiya Karê Kurdistanan PKK’ê ev gav bi biryara fesix û çekberdanê avêt lê dûre gavên herî bingehîn ên ku ji dewleta Tirk dihatin hêvîkirin nehatin avêtin. Weke mînak; divê li gor qanûnên xwe tevbigere, ango biryarên Dadgeha Destûrî bi cih bîne û tavilê girtiyên dozê bên berdan. Divê pergala qeyûman bê bidawîkirin û şaredarên hilbijartî vegerin ser erkên xwe, divê desteserkirina mafên girtiyan bi dawî bibe (şewitandina înfazê), divê rêziknameya înfazê ya ku hemû girtî li benda wê ne bê çêkirin.

Lê belê heta niha ji aliyê dewleta Tirk ve tu gavên piratîk ji bo pêvejoya Aşîtî û Civaka demokratîk ne hatin avêtin, dewlet Tirk tenê axaftinê dike û di pratîk de tu gavan, ji bo serxistin û pêkanîna pêvejoya Aştî û Civaka demokratîk navêje. Helbet ev yek dide diyarkirin ku dewleta Tirk naxwaze ku mafê hêviyê û pêvajoya Aştî û Civaka demokratîk bi ser bikeve. Dewleta Tirk naxwaze mafên Kurdan di destûr û dewletê de hebin. Her timî hewl dide bi rêya şeran, komkujî, qirkirina etnîkî îradeya Kurdan bişkîne. Di heman demê de, ji bo ku pêvajo bi serbikeve pêwîst e dewleta Tirk gavên pratîk bavêje.

### Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk ji avakirina aramî û aştîyê ye

Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk ji bo avakirina aramiyê û aştiyê li Kurdistanê, Rojhilata Navîn û cîhanê gaveke girîng e, pêvajo aramî û aştiyê pêk bîne. Milyonan xelk di nava metirsya qirkirinê ne de ye, Rêber Apo bi destpêkirina Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk gaveke girîng avêtî ye. Di vê pêvajoyê de ya girîng ew e ku li ser xaka Kurdistanê aramî û aştî pêk were, ji ber rewşa Kurdistanê bi giştî bi hev re girêdayî ye, heke pêvajo li deverekê bi ser bikeve dê bandora xwe li devera din bike. Pêvajoyê hişt agirbestê bê ragihandin û îro jî li Rojava bi rengekî siyasî gefên ku dewleta Tirk li ser herêmê jî tên xwarin. Lê belê wê bi pêvajoyê re ev herêm bi giştî berê xwe bide rewşeke aram, ew aramî jî li Rojhilata Navîn aştiyekê ava bike. Dê kêşeya kurdî ya ku bi sedên salane heye û dem hatiye ku gelê Kurd mafên xwe biparêze, çareser bibe. Bi vî awayî rewşeke nû ava bibe, gelê Kurd û miletên derdora wê bi aramî û aştî bijîn.


Di derbarê xebatên pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk de, Parlementera DEM Partî Newroz Oysal ji Rojnameya me re axivî.

Parlementera DEM Partî Newroz Oysal axaftina xwe wiha qedand: “Ev gavên ku hatin avêtin bi pêşengiya Rêber Apo hatine avêtin. Di heman demê de, bi îradeya Partiya Karkerê Kurdistan PKK’ê û bi îradeya hêzên ku diyalok û çareseriryê gelek gav hatin avêtin. Ev gav jî weke daxuyaniya Rêber Apo hat dayîn, fesxkirina Partiya Karkerê Kurdistanan PKK’ê, biryara agirbesê, biryare çek şewtandinê, biryara vekişandina PKK’ê ji Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê hatin kirin. Lê belê dewleta Tirk pêvejoyê di aliyê ewlkariyê de dinrxîne û sînordar dibîn e. Herwiha komîsyon wê raporeke hevbeş ava bike û çûna wan ji bo girava îmraliyê were nîqaşkirin. Pêwîst e dewleta Tirk dev siyseta inkar û baskê berde, divê şertên demokratîk pêk werin û wiha berdewam kir: “Sedema ne pêkanîna pêvajoyê, mafê hêviyê û azadiya Rêber Apo nebûna îradeya siyasî û nepêkanîna mafê hêviyê ye. Ji ber ku îrade dernakeve mijar weke mijareke ewlehî û leşkerî tê destgirtin, herwiha aliyên wê yên siyasî, hiqûqî, civakî niha ji aliyê dewleta Tirk ve tê rawestandin. Di heman demê de, mafê hêviyê mafekî hiqûqî û navnetewî ye, ji ber vê yekê em raserast nikarin bêjin ku bi îradeyeke siyasî bi cih nayê, pêwîst e asta hiqûqî were avakirin. Lê mixabin bi vî rengî çênabe, ji berk u Rêber Apo mextebekî siyasî û sereke ye, nêzîkatiya wî di aliyê hiqûqî û tecrîda ku tê berdewam kirin, berfetê ku nehatiye dayîn rewşeke siyasî poltîk dide nîşandan. Ji ber ku ev nîskatî teng di aliyê ewlehiyê de xwe dide nîşandin, ne rê li ber siyaseta demokratîk vedike û ne çareseriya pirsgirêka Kurd û Rojhilata Navîn tê kirin. Ji ber vê tecrîd li ser Rêber Apo berdewam dike, herwiha li gorî pêvajoyê rewşa mafê hêviyê tê kirin.”

### ‘Kar di aliyê siyasî û hiquqî de berdewam e’

Newroz anî ziman ku ji bo pêvajo bi ser bikeve ji aliyê DEM Partî ve gelek xebat tên meşandin û wiha pê de çû: “Li ser navê DEM partî diyalok tên kirin û di komîsyon de kar û xebat di nava civakê de tên meşandin. Herwiha di nava civakê de, zêdeyî 4 hezar kes di komîsonê de civînin û bi ciwanan re danûstandin hatin kirin. Di heman demê de, meş û çalakî hatin lidarxistin, da ku pêvajo pêş bikeve û aştî di nava civakê de were qebûlkirin. Lê belê ev yek ne tenê ji bo gelê Kurd, ji bo civaka dewleta Tirk pêvajo sereke pêwîstiyeke. Ji ber dema ku pêvejo serbikeve divê ku di nava civakê de were qebûlkirin. Herwiha pêwîst e ku di asta siyasî û hiqûqî de jî lihevkirin çêbibe, kar di aliyê hikûqî û siyasî de, ji bo Mafê Hêviyê berdewam e. Berî her tiştî, şertên hiqûqî divê were guhertin. Mafê hêviyê divê bi fermî were pêkanîn, tecrîd bi dawî bibe û şertên diyalokê were vekirin. Civaka sivîl, jin, ciwan û şertên civakî divê beşdarî pêvejoyê bibin.”

## FENER



### Dema Ku Ragihandin Zemînê Şîdetê Tapan Bike, Komkujî Rewa Dibe?!

**Idrîs Henan**

Piştî êrişa bloka bermahiyên DAIŞ û Baas`ê li ser Şêx Meqsûd û Eşrefiyê li Helebê, xeta ragihandina paralel behsa serketinên xeyalî dikir û li pey wê bû ku çîrokên derew ên nikarin li hember rastiyan xwe rabigirin dihûnandin. Di eslê xwe de êriş ne tenê bûyerek leşkerî dûrî xeta siyasî û medyayî bû, lê belê xelekek zincîra giştî ya hemleyên nefret, kîn û rewakirinek birêkûpêk bû. Li ser vê bingeha çêkirî, tişta piştî êrişan, hewldanên înkar û lihevkirina bi realîteyê re ne. Çi xwendinek dûrî vê rêzeamadekariyan be, naverokê vala derdixîne û vediguherîne tenê hinek realîteyên meydanî. Lê ya rast ew e ku; di cewherê xwe de mînakek zelal a endustiriya şîdetê li dijî aşîtiya civakî û ewlekariya niştimanî û rewakirina wê ye. Herdu taxên Helebê, Şêx Meqsûd û Eşrefiyê, bi wateya leşkerî, ne çeperên şer bûn. Deverên ku bi deh hezaran sivîl lê jiyan dikirin bûn. Dema mirov li naverok, şêwaz û awayê hedefgirtina herdu taxan binêre, tê digihêje ku li gorî zexim, demjimêra êrişan û bandora ku çêkirî, sivîlên taxan ne qurbaniyên naberê bûn, lê belê hedefa rasterast a êrişkaran bûn. Yanê parçeyek armanca navendî ya êrişkaran ew bû ku di derheqî sivîlan de komkujiyan pêk bînin. Pirs bingehî ya bi vê tabloyê re xwe dide der ne kê dest pê kir? Lê belê çawa zemîna êrişê ya derûnî û siyasî hate amadekirin ku cînosîdê bi beşek civakê bide qebûlkirin?

Berî êrişan xîtabekî ku cilên sivîlbûnê ji ser herdu taxan bêxîne dest pê kir ku wekî du deverên derveyî zagonê hatin hesibandin. Her wiha bangeşiyek wisa kirin ku beşek civakê bidin îqnakirin qaşo herdu tax hêlîna terorê ne! Cewherê xîtabekî wisa, ji rengdayînê pirtir, ji nû ve pênasekirin û înkarkirina nasnameya rengdêr a herdu taxan e. Yanê pirrengiya li herdu taxan hat înkarkirin û tenê girseyek yekreng dikare were hedefgirtin. Bi hewla avakirina vê hişmendiyê re, ti îtîbara jin, zarok û temenmezinan namîne, hemû jî dibin parçeyek vê tabloya giştî. Bi gotinek din; bi rakirina sîfeta sivîltiyê re, sîfeta mirovatiyê jî ji ser şêniyên taxan rakirin.

Zimanê ku platformên Colanî bi kar dianîn, ne bêalî bû, berovajî bi zanebûn û plankirî bûn ku gefê li komeke pêkhateyên civakê dixwe û weke xeter û xayîn dide nasîn. Aliyê dîrokî ve tê zanîn ku ev cureya xîtabê ji bo rê li ber tundiyê veke tê bikaranîn. Yanê tu beşeke civakê didî îqnakirin ku ew qurbanî “ne bê sûc in” û “ne wek me ne”. Bi vî awayî jî hestên mafdariya kuştina wê girseyê ava dikî û aliyê derûnî ve mirovan bê helwest dihêlî.

Piştî êrişan, rola ragihandinê derbasî qonaxek xeternaktir bû, rola qurbanî û tawabaran jî berovajî dikin. Yanê li şûna ku rewatiya êrişan li ser taxan were pirsîn, şênî weke sedema êrişan tên sûcdarkirin. Bi gotinek rastir; mafê qurbaniyan ê gilîkirinê jî tê xesibkirin. Ji ber vê jî hemû kiryar, binpêkirin, kutşin, koçberkirin û komkujiyên hatine kirin weke “tedbîrên ewlekariyê” hatin binavkirin. Wisa jî têgihaştina bûyerê diguherin, şîdet û cînosîdê rewa dikin!.

Di encamê de ragihandina paralel bû sedema sereke ya kuştin, koçberî û wendayiyên mezin. Bi xwe re realîteyek nû da avakirin û deriyên fireh ên guherîna demografîk vekirin. Lew re; ragihandina ku li ser xîtabê nefret, sorkirin û kînê diwerime, tundûtûjiyê rewa dike, li hemberî zilm û zordariyê bêdeng dibe, vediguhere şirîkê sûc, bandora wê jî bi avakirina raya giştî ya ku tundiyê weke alaveke aşîtiyê hildibijêre, demdirêj dimîne.

Eger êrişên li ser Şêx Meqsûd û Eşrefiyê bi vî çavî werin xwendin, em dê fêm bikin ku êriş ne li ser pêkhateyek tenê ye. Lê belê nimûneyeke ku dikare li dijî çi gelên dîtir be, dema ku şert û mercên razber û şênber guncaw bin, were dubarekirin.



# ‘Şanoyeke rexneyî- komîdî li ser xebata rewşenbîrî ye’

Ebdilmecîd Xelef da zanîn ku şanoya Rewşenbîr, şanoyeke komîdî- rexneyî girêdayî xebata rewşenbîrî ye û got, : “Di şanoyê de rewşenbîr komîteyên amadekar û xebata wan dinirxîne.”

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

Şanoya Rewşenbîr yek ji şanoyên Kurdî ye ku ji hêla Ebdulcebar Hebîb ve hatiye nivîsîn, ew nivîskarê wê ye û hem jî bi nivîskar Ebdilmecîd Xelef re bi erka lîstikvaniya wê dike. Ew berhemeke ya Dibistana Şano ya girêdayî Desteya Çandê ya Herêma Cizîrê ye ku di sala 2025’an de hatiye nivîsîn û pêşkêşkirin.

Bi dirêjahiya 40 deqeyan ev şano gelek mijaran ji temaşevanan re radixe ser dika şanoyê.

Derbarê şanoya Rewşenbîr de Ebdilmecîd Xelef ku yek ji lîstikvanê wê ye, ji rojnameya me re axivî.



### ‘Şanoyeke rexneyî- komîdî li ser xebata rewşenbîrî ye’

Ebdilmecîd Xelef da zanîn ku şanoya Rewşenbîr, şanoyeke komîdî- rexneyî girêdayî xebata rewşenbîrî ye û wiha bi lêv kir: “Şanoya Rewşenbîr di sala bûrî de, berî destpêkirina Festîvala Çandê- Beşa Çîrokê ya duyemîn bi du mehan li ser hate karkirin. Me bi dirêjahiya 25 rojan pirova çêkir, di wê festîvalê de jî cara yekem li Baxçê Xwendinê yê bajarê Qamişlo pêşkêş kir, tevî ku şert û mercên pêşkêşkirina şanoyê pêknehatibûn. Ev şano xebata sazî, yekîtî û kesên ku di qada rewşenbîrî de kar dikin, dinirxîne. Kêmasî û lawaziyên vê qadê derdixe û rexneyê dike. Armanc jê ew e ku rewşenbîr, saziyên rewşenbîrî û wêjevanan bi erkê xwe rabin û tişta ji wan tê xwestin pêkwere. Eger ev qad vala ba, wê hatiba gotin ku kes li qada rewşenbîrî tuneye, sazî, rewşenbîr û nivîskar hene, xebat jî heye, lê ne ew xebata pispor a ku tê xwestin e. Em doza xebata rewşenbîrî û rewşenbîrên bispor dikin, da ku xebateke bi serkeftî çêbibe, hem jî festîval û pêşbirk bi awayekî durist bi encam bibin. Nimûne em dibînin ku di festîvalên çîrokê de hin çîrok hene asta wan tuneye û bi ser dikevin û hin çîrok xwedî ast in û bi ser nakevin. Piştî salên ji xebata saziyên me yên rewşenbîrî, pêwîst e em bipirsin gelo divê em gavan ji bo pêşketinê bavêjin an jî em gavan bi paş ve bavêjin.”

### ‘Şanoya me, komîteyên amadadekar ên pêşbirk û festîvalan rexne dike’

Xelef diyar kir ku şanoya Rewşenbîr komîteyên amadekar û xebata wan dinirxîne û wiha got: “Yek ji mijarên vê şanoyê mijara komîteya amadekar a nirxandina berheman û pêşbirkên rewşenbîrî bû. Me di şanoyê de aniye ziman ku komîteyên amadekar bi erkê xwe ranabin weke ku tê xwestin, an jî ne pispor in di warê nirxandinê de. Diyardeyek heye ku komîteya nirxandinê kesayetan nas dikin û wan bi ser dixin, yan xweşik berheman nanirxînin an jî asta kesên di komîteyê de tuneye. Kesên rewşenbîr ên ku di mijara ku tê nirxandin de ne pispor bin, bila nekevin nav xebata komîteyê, gelo ev kesên wiha di wê komîteyê de çi dikin. Dema ku ji min were xwestin ku tevlî pêşbirk an festîvalekê bibim, nimûne eger mijar girêdayî dîrokê be, ez ê nekevim wê komîteyê ji ber ku ez ne dîroknas im. Lê eger komîteyek ji bo şano, çîrok an jî romanê hebe ez ê tevlî bibim ji ber ku ez dikarim xebateke wiha bikim. Divê kesên ku dikevin komîteyên amadekar û nirxandinê de divê şareza û jêhatî bin, eger ne wiha be wê ziyan bigihêjîne rewşenbîrên ku tevlî wê pêşbirk an festîvalê bûbne.”

### ‘Me rexneya ragihandinê jî kiriye’

Ebdilmecîd destnîşan kir ku di şanoya Rewşenbîr de rojnamevan hatine rexnekirin û wiha domand: “Di piraniya çalakiyên ku çêdibin de ji hêla hevalên me yê ragihandin ve hin astengî tên derxistin. Ew dibin sedem ku kesên cemawer xebata li ser dikeyên çalakiyan çêdibin, nebînin. Nimûne em bêjin dema ku ez tevlî xebateke rewşenbîrî dibim, çi şano be, çi semîner nêzî 8 rojnamevan dikievin pêşiya min, ne ez tiştekî dibînim û ne kesên mêvan jî tiştekî dibînin û di encamê de em tu sûdê wernagirin. Me ev mijar xist nava şanoya xwe de û me ev yek rexne kir. Gelo çima ev pirsgirêk derdikeve, pirsgirêk ji rojnamevanan e, yan ji saziya ku bi wê xwebatê rabûye. Em her tim weke Desteya Çandê dibêjin da ku çalakî bi rengekî serkeftî derbas bibe, bila rojnamevan li pişt mêvanan bisekinin û karê xwe yê rojnamegeriyê bikin yan jî li kêlekê bisekinin. Bi taybet dema ku şano tê pêşkêşkirin. Berî ku em şano pêşkêş dikin, li kur be em şert û mercan datîin ku divê rojnamevan nekeve pêşiya cemaweran, berî ku em li HRRK’ê şano pêşkêş bikin, me ev yek pêkanî. Rewşenbîr tevlî çalakiyan dibin, lê rojnamevan dibin asteng li pêşiya wan.”




### ‘Nivîskar û asta helbestê bûne mijarên şanoyê’

Şanoger û nivîskar Ebdilmecîd Xelef anî ziman ku nivîskar, rexnegirî û asta helbestê bûne mijarên şanoya Rewşenbîr û wiha bi dawî kir: “Di navbera nivîskar û rexnegiran de hin nakokî çêdibin, dema ku nirxandinek li ser berhemekê tê çêkirin û kesê rexnegir rexneya berhemekê dike, neqebûlkirin li cem nivîskarên me dibe bertek. Me ev mijar girtiye dest di şanoyê de, nerîna nivîskaran şaş e derbarê rexnevan, ji ber ku rexne dibe sedemek ji bo pêşketin û avakirina berhem û nivîskar, ev yek ne tiştekî bişerm e, lê belê xebateke pîroz e ji bo pêşketina wêjeyê. Mijara din jî li ser asta helbestê, li Rojavayê Kurdistanê asta helbesta Kurdî qels bûye, rast e ku hejmara nivîskaran û rêjeya çapê pir e, lê ya girîng asta berheman e. Li hemberî wê asta şaxên wêjeyê yên din lawaz e, gelo rêjeya romanan baş e? na, deqên şanoyê li gorî tên xwestin tên nivîsandin? Na, ji xwe lêkolîn ji kok ve tuneye. Li Rojava asta xwendinê li cem rewşenbîran tuneye, pêwîst em hemû rewşenbîr ji hêla xwe ve vê yekê çareser bike. Divê helbestvan romanê bixwînin, hem jî romannivîs helbestê bixwînin.”

# Lalê gote min

**Cîger Efrîn**

Min Lale dît, stûxwar û pir melûlbû
J’ firqanê an nedîtina rojêbû
Dibe ku ji nedîtina hebîb be
Ew jî wekî dilê min sêwî mabû

Got; dest nede min rêwiyê rêya xwe
Di ber min re çûn gelek aşiqên xwe
Hinekan ez bêhn kirim û b’ min şabûn
Piran jêkirim, xistin ber sînga xwe

Min got; Lale l’ ser koka xwe şêrîn e
Dilkêşer, delal, rind û xweş bi bêhn e
Lê nezanên delalan pirin Lalê
Nirxdarê şêrînan kêm û pir nin e

Got; l’ ser min û gulan dengbêj dibêje
Dilê guhdaran bi stranan disoje
Lê çima ji kok me diqurifînin
Kesek j’ wan re rastîya me nabêje

Min got; Lalê hûn delalên leylan in
Di şevê de wekî parîyê nan in
Her kes qala eşqê dike, kanê eşq
J’ evîdaran re dibêjin hûn dîn in

Got; em j’ bo aşiqan, ne bo çêlekê
Zeman zemanê piran ne yê yekê
Lê çibkim! kêm in aqilmendên zeman
Yek heye dibêje; sedan bi yekê

Min got; me aqilmend hişte bi tenê
Rewşekî wiha tuneye l’ vê dinê
Xwîna dil e, nûra çav e, heqa heq
Ew e hozanê rindî û evînê

Got; ez dinas im wî pir xweş dinas im
Ma te negot çima stûxwar, melûl im
Tu bûyî derdfiroş û êşbarê dil
Min divê dengê wî, bê wî bêhal im

Dilê min coşdar û şaye bi Lalê
Gîyana min pir xweş mist da delalê
Rabûm! l’ lûtkeya kox roj diçirisî
Bûme dînê çolê, berî ne l’ malê

# ‘Aboriya Koperatîv pêşxistina aboriya civakê ye’

Rêvebera Komîteya Koperatîv a Bakur û Rojhilatê Sûriyê Êvar Ferho diyar ku Aboriya Koperatîv piştî şoreşa Rojavayê Kurdistanê xwe birêxistin kir û got: “Aboriya Koperatîv pêşxistina aboriya civakê ye.”

**Diyala Nîdal\Qamişlo**



Çanda Aboriya Koperatîv lêkolîn û analîzkirina sîstem û pratîkên aborî yên cûda dike. Têkiliya di navbera aborî û Çanda Koperatîv de kûr e û çand bandorê li ser tevgerên aborî dike û taybetmendiyên şekil dide. Di heman demê de çand bi xwe wekî berhem û kelûpelek tê dîtin. Sîstema çanda aboriya Koperatîv dibe alîkar ku mirov fêm bike k a nirx û baweriyên wek ol an adet çawa bandorê li hilberîn, xerckirin û tewra polîtîkayên aborî dikin, bi vî rengî piştgirî dide polîtîkayên pêşkeftina domdar yên aliyên çandî.

Sîstema Çanda Aboriya Kompertîv li Bakur û Rojhilatê Sûriyê, piştî Şoreşa Rojavayê Kurdistanê hate birêxistin kirin. Herwiha ji wê demê heta niha bi riya sîstema Aboriya Koperatîv civak li gorî sîstema Rêveberiya Xweser proj û karê xwe dide meşandin. Di derbarê Sîstema Çanda Aboriya Koperatîv li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê de, rêvbera Komîteya Koperatîva Bakur û Rojhilatê Sûriyê Êvar Ferho ji Rojnameya me re axivî.

**‘Em dixwazin kes bê kar nemîn e’**

Êvar Ferho anî ziman ku bi riya Aboriya Koperatîv anjî Koperatîva Civakî civak projeyên xwe pêş dixe û wiha got: “Hedef û armanc ji sîstema Aboriya Aboriya Koperatîv rêxistin û pêşxistina civak, herwiha da ku civak bi xwe piroje û karê xwe bide meşandin, pêş bixe. Lê belê civak li gorî sîstema Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê kar û aboriya xwe li pêş dixin. Herwiha bi vê yekê re gelek armanc tên weke peydekirina kar, tevlîkirina jinan di nava kar de. Di heman demê de, em dixwazin ku kesek di nava civakê de, bê kar nebînin û gelek hewldanên me ji bo vê yekê hene. Da ku civaka me hebû bi rengekî komînal û aboriya civakî karê xwe bide meşandin. Gelek projeyên me yên bi vî rengî hebûn û heta niha berdewam in.

Piştî şoreşa Rojavayê Kuridistanê sîstema Aboriya Koperatîva li Bakur û Rojhilatê Sûriyê xwe birêxistin kir û heta niha ev rêxistibûn berdewam e. Lê belê serkeftina sîstema Aboriy Koperatîva li ser hişmendî û tecrîbeyên civakî ye, herwiha gelek sedemên vê yekê hene. Di heman demê de, ev hemû girêdayî hişmendiya komînal, aboriya civakî, tecrîbe û helbet tecrîbe jî rola xwe pir dilîze. Herwiha em hewldanên xwe dikin ku her tim li gorî çand xwe, sîstema Rêveberiya Xweser sîstema Aboriya Koperatîva serbixin.”

**‘Pêwîst e projeyên me serkeftî derbas bibin’**

Rêvbera Komîteya Koperatîva Bakur û Rojhilatê Sûriyê Êvar Ferho axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Ji bo serketina Sîstema Aboriya Koperatîva berdewam bimîne, pêwîst e pirojeyên me serkeftî derbas bibin. Helbet ev yek ji bo me cihê serbildahî û şanziyê ye. Di heman demê de, serkeftina projeyên me hêzê dide ku em bi rengekî serkeftî xebatên xwe berdewam bikin. Lê belê bi vî rengî sîstema Aboriya Koperatîv didome û serkeftî ye.”

# Li kantona Cizîrê êmên sewalan tê belavkirin

**Navenda Nûçeyan**

**Beşê Sewalkariyê li kantona Cizîrê dest bi belavkirina êmê sewalan li sewaldarên kantona Cizîriyê kiriye û heta niha ji sedî 80 sewaldarên kantona Cizîrê êm ji bo sewalên xwe wergirtine.**

Belavkirina êmê sewalan, ji aliyê komîteyên pispor yên komîteya Sewalkariyê ve tê domandin. Li gorî Beşê Sewalkariyê rêjeya temamkirina karê belavkirina êmê sewalan gihîştiye nêzî ji sedî 80 û heta niha jî li hin bajar û bajarokên girêdayî kantona Cizîrê berdewam dike. Belavkirin bi riya 32 komîteyên navendî tê kirin, di heman demê de di bin çavdêriya Mecilsa Aborî û Çandiniyê de û bi hemhangiya Komîteyên Çandinî û Sewalkariyê yên di rêveberiyên herêmî de xebat tê meşandin.

**Rêjeya êmê sewalan**

Li gorî encamên belavkirinên dawî, sererastkirina rêjeya êmên Sewlan hatiye cudakirin, herwiha rêjeya sewalên biçûk ji her serîkî re 18 Kg. Di heman demê de, rêjeya êm ji bo her serî sewalek mezin 180 Kg e. Ev zêdebûn di encama lêvegerîneke rasteqîne ên sewalkariyê de ye, bi berçavgirtina lêçûnên zêde yên xwedîkirina sewalan. Ji bilî şert û mercên avhewayê û bandora wan li ser çêregehên xwezayî ku pêwîstî bi dabînkirina rêjeya êmê sewalan heye, ji bo misogerkirina berdewamiya hilberînê.

Li gorî Beşê Sewalkariyê yê kantona Cizîrê belavkirina êmê sewalan dê li gorî prensîb û rêziknameyên pejirandî û li gorî encamên serjimêriya dawî were kirin, û tekez kir ku her cotkarek ku di serjimêriyê de nehatiye tomar kirin dê di belavkirinê de neyê tomar kirin, ku ev yek girîngiya hevkariya bi komîteyên serjimêriyê re û temamkirina daneyên pêwîst bi awayekî rast destnîşan dike.

**‘Pêwîst e sewaldar biryaran pêk bînin’**

Ji aliyê beşê Sewalkariyê ve bang li hemû sewaldaran hate kir ku pêwîst e biryarên ji aliyê komîteyên pispor ve hate kirin, pêk bînin. Da ku ev gav di wextê xwe de biqede, û tekez kir ku serkeftina serjimêriyê dê rasterast bandorê li ser asta piştgiriya ku di serdema pêş de ji bo sewaldaran were dayîn bike.



Li gorî Ofîsa ragihandinê ya Mecilsa Aborî û Çandiniyê ku ev belavkirin gaveke bingehîne ji bo rêxistinkirina sektora sewalkariyê di kantona Cizîrê de, lewma armanc wê ew ku mekanîzmayên plansazkirin û piştgiriyê baştir bike û dabînkirina pêdiviyên bingehîn ên sektorê sewalkariyê zêde bibin, ku ev yek jî dibe alîkar ji bo piştgiriya ewlehiya xwarinê ya herêmî. Weke tê zanîn ku kantona Cizîrê yek ji deverên sereke yên hilberîna sewalkariyê e, beşeke mezin ji niştecihên wê sewalan kedî dikin.

# Projeyeke nû ya avê êşa tîbûnê li gundê Elbû Receb ê Tebqayê bi dawî dike

**Jîn Hisên/Tebqa**

**Şaredariya Gel a bajarokê El-Hemam a kantona Tebqayê, li gorî daxwazên şêniyan û bi armanca dabînkirina çavkaniyek avê ya sabît û baştirkirina rewşa xizmetguzariyê li gund, projeyek avakirina pompeke avê ya nû li gundê Ebû Receb pêk anî.**



Wekî beşek ji hewildanên berdewam ji bo baştirkirina xizmetguzariyan û dabînkirina pêdiviyên bingehîn ên şêniyên herêmê, nivîsgeha avê ya Şaredariya Gel a El-Hemamê ya kantona Tebqayê projeyek sazkirina avê li dar xist û di mehkê de kar û xebat li ser hat kirin ji bo peydakirina avê ji zêdetirî 4000 malbatên vê deverê, piştî demek dirêj ji kêmbûna giran a gihîştina avê.

**Astengiyên giran a peydakirina avê**

Gundê Bû Receb berî pêkanîna projeyê xwe dispartin tankerên avê, ku di encamê de gelek malbat ji avê bê par diman, di heman demê de pirsgirêka qirêjî û bihabûna avê nedihat kirin çareser, ev yek jî bû sedema gelek giliyan. Gundê El-Bûreceb ji ber nehevsengiya gihîştina avê gelek astengî dikişand, aliyê başûr ji pompê gundê Ebû Qubayi dihat dabînkirin, lê aliyê bakur bi kêmbûna avê ya cidî re rû bi rû ma. Pirsgirêka avê di werzê havînê de pir xirab dibû. Bi sazkirina pompeke nû 4000 malbat gihaştin aveke paqij û bi rêxistinkirî, ku wê şert û merên wan yên rojane sivik bikin.

**Çareserkirina pirsgirêkê**

Pompeya nû dê demên li benda avê bi girîngî kêm bike, wê rê bide malbatan ku xwe bispêrin çavkaniyek sabît, ku dê bi vî rengî astengiyên rojane sivik bike, şert û mercên jiyanê yên sabît ji bo hemî şêniyan misoger bike.

Projeya sazkirina avê di destpêka kanûna sala 2025‘an hat destpêkirin, kar û xebatê wê mehekê dewam kir û di destpêka sala 2026‘an dest bi pompekirina avê kir.

Ev proje dê bibe alîkar ji bo hêsankirina peydakirina avê ji bo niştecihan û astengiyên rojane kêm bike, herwiha wê pirsgirêka avê ya ku ev demeke mezin êş jê dihat kişandin, çareser bike.

**Aliyê teknîkî**

Proje bi rêya danîna pompeyeke nû ji bo dabînkirina avê ji Çemê Firatê ve girêdayî ye, ku dê ji bo nêzîkî 4hezar malbatan avê peyda bike, nemaze li deverên ku di demên berê de ji kêmbûna giran a dabînkirina avê êş kişandine.

Ev yek bi sazkirina pompeke din a 180 hespî li stasyona pompekirina avê ya El Bûrcebê, digel danîna boriyeke avê ya nû ya 2800 metreyî û 6 înç, ku beşdarî baştirkirina pompkirina avê û baştirkirina aramiya wê li gundên sûdmend bû, pêk hat. Tîmên teknîkî yên nivîsgehê di heman demê de li ser sazkirin û girêdana burcên elktrîkê bi temamî xebitî.

Hate destnîşan kirin ku xeta avê bi beşdariyeje civakî ji gundiyan ve hatiye bicihkirin, di heman demê de pompe û aliyê teknînî ji hêla şaredariya bajarokê El-Hemam hat peydakirin û amadekirin. Di modelek ku hevkariya di navbera saziyên xizmetguzariyê û civaka herêmî de nîşan dide da ku li hember zehmetiyan serbikevin û asta xizmetguzariyên bingehîn baştir bikin.



# ‘HTŞ’ê hêza xwe ya biryar û leşkerî nîne, Tirkiyê serpereştiya wê dike’

Rojnamevan Ekrem Berekat diyar kir ku yê niha sazî û ragihandina Sûriyê organîze dike, dewleta Tirk e, ji ber hikumeta demkî ne xwedî hêza biryar û leşkerî ye û got, “Di şexsê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê de xwestin Heleb bê Kurd bihêlin û Sûriyê giştî di nava parçebûnekê de derbas bikin.”

**Ronahî Sadûn/ Qamişlo**



Derbarê dîroka Kurdan li Helebê, êrişên li ser taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê, herwiha eşkerekirina rûyê ragihandinên dijber ku gelek idîa kirin, Rojnamevan Ekrem Berekat bersiva pirsên Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Rewşa Helebê, berxwedaniya li taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê, armanc û êrişên ku li ser van taxan hat kirin ji aliyê hikumeta demkî ya Sûriyê bi hevkariya dewleta dewleta Tirk çibû?**

Li Helebê taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê, taxên resen ên Kurdan e ku ji dîrokê heya roj îro hebûna Kurdan, hebûnekî resene û ji damezrînerên Helebê ne. Herwiha di Sûriya nû de rolekî pir mezin lîstin ku Heleb niha ketiye asta paytexta Sûriyê ya pêşesazî, bi serkêftina malbatên Kurd e. Berxwedana Şêxmeqsûd û Eşrefiyê jî, ne ji niha de ye. Van taxan cara yekemîn di 15’ê Sibata 2001’ê de serhildan li beramberî rejîma Baasê kirin ku meşekî herî girseyî ji bo şermezarkirin Komployê, hem jî ji ber hinekî zextên hikumeta Sûriyê li ser hebûn ê, lidar xistin. Berxwedaniya taxan ji wê rojê ve ye. Di 2004’an de jî yê herî destek da serhildana Qamişlo, her du tax bûn.

Di 2011’an de dîsa beramberî Baasê rawestiyan ew bûn. Gelê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê ji bo vîn û îradeya xwe, têkoşîneke pir mezin dane meşandin û wan serî ji kesî re ne tewandiye. Piştî vê tax hatin dorpêçkirin, bomebarankirin bi topan, balafiran êriş kirin, lê tax teslîm nebûn, vîn û îradeya xwe parastin. Di sala 2016’an de jî çeteyan êriş kir, çeteyên ku îro êriş kirin, berê 2016’an bi cil û bergên dîn êriş kiribûn. Jiyana van taxan wiha berdewam kir aliyekî berxwedanî, aliyê din dorpêç û êriş, heya niha jî wiha dewam dike. Piştî Baas hilweşiya, nirxandinekî gelên Sûriyê û kesên demokratk ji bû Sûriyê hebû. Lê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê ji ber ku zilm û zor ji van çeteyan dîtibûn, zanîbûn rewşa Sûriyê ber bi ku ve diçe. Lewra wan di taxên xwe de bêtir xwe parastin û her tiştê xwe li pêş xistin.

Piştî lihevkirina peymana 10’ê Adarê, hevpeymana 1’ê Nîsanê hate çêkirin. Ew hevpeyman jî di navbera Meclisa Giştî ya Taxên Eşrefiyê û Şêxmeqsûd û hikumeta demkî de bû, xalên wê diyar bûn. Li gorî hevpeymanê, Hêzên Sûriya Demokratîk wek leşkerî xwe ji taxan vekişandin û parastina taxê ji aliyê Hêzên Ewlekariya Hundirîn hate kirin. Hevpeyman îmzekiriye li ser erdê ye û hinek hêzên gerantor tê de hebûn. Lê hikumeta Colanî tax dorpêç kirin û êriş bi ser de anîn ku ji 25’ê Îlonê ve nehiştin sotemenî, derman, alavên jiyanî derbasî taxan bibin, di serî de jî alavên tenduristî, ev beramberî taxan hate meşandin. Di 6’ê Çileyê de jî êrişî taxan hate kirin, beriya êrişên li ser taxan civînekî di navbera Hêzên Sûriya Demokratîk û hikumeta demkî de hatibû lidarxistin. Rûxmê rayedarên QSD’ê diyar kirin ku civîn asayî û bi rengekî erênî derbas dibû, tenê mabûn îmze bikin li ser lihevkirinên heyî, lê rayedarekî hikumetê mudaxele kir dibêjin ew jî Şêbanî ye zilamê Tirkiyê ye. Mudaxeleya Şêbanî nehişt civîn biçe serî û taloq kirin. Piştî vê êriş hatin kirin, ev êriş jî rasterast dewleta Tirk dike, ne HTŞ’ê. Ji ber HTŞ’ê ne hêza xwe ya biryar û ne jî ya leşkerî, nîne. Berî ku HTŞ’ê derbasî Sûriyê bibe, her kesî wan bi çetan didan naskirin, ya din jî HTŞ’ê hejmara xwe 3 hezar çete derbas nedikir, di Idlibê de nikarîbûn tiştekî bikin û gavakê bavêjin. Lê HTŞ’ê bi destekdayîna Tirkiyê xwest vîn û îradeya gelê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê têk bibin. Di şexsê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê de, dixwazin Helebê bê Kurd bihêlin. Piştî civîna li Parîs a ku di navbera Sûrî, Îsraîl û Amerîka de çêbû, tê de mijara Colan çareser kirin ku du parêzgehên Colan Qumeytera û başûrê Sûrî teslîmî Îsraîl kirin, dixwazin Heleb jî bi rengkî ji rengan radestî Tirkan bikin, ji ber piştî diyalogên Tramp û Netenyaho, diyalogên Tramp û Erdogan jî çêbûn, di ortê de ev mijar derket û êriş kirin. Armanca sereke valakirina Helebê ji Kurdan ye.

**Di êrişên li ser taxên Kurdan ên Helebê û beriya wê jî li Efrîn, Minbic û Bendava Tişrînê de jî gelek idîa hatin kirin wekî ku endamên PKK’ê di Helebê de hebûn, di her şerekî de her carê idîak tê belavkirin û di nav gel de jî tirsekî didin avakirin wekî ku Heleb radest girtin an jî ev dîmenên komkujiyên ku derdiketin pêş, ji bo vê mijarê nirxandinên te çi ne?**

Şerekî pir qirêj tê meşandin û ev şer ne ji niha ve ye. Şer li ser çar xalan tê meşandin, şerekî qirkirinekî fîzîkî ye, şerekî siyasî di astekî pir mezin de, şerekî diplomasî ye û yê serkêşiya van her siyan jî dike, şerê ragihandinê ye. Me dîroka ragihandinê xwendiye û bi salan jî tê de dixebitin. Ragihandin çi ye? gerek ew çanda exlaqan û pîvanan biparêze. Ji ber wisa her tim dibêjin; kesên di çapemeniyê de, weliyî û nebiyên ragihandinê ne, yan jî nebiyên civakan û gotinê ne. Lewra insanên di ragihandinê de bixebitin, pêwîst e xwedî pîvan, exlaq û nirx bin. Lê tiştê me dît tersî wê bû, ev çend sale beramberî vîn û îradeya azad a gelên Kurd, Kurdistanê û gelên demokratîk şerekî qirêj tê meşandin.

Niha em behsa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê bikin, piştî hevpeyman hat girêdan, rehetî di Sûrî giştî de hate çêkirin. Rehetiya di Sûriyê de hate çêkirin jî, ji ber hêzên demokratîk Bakur û Rojhilatê Sûriyê, Şêxmeqsûd û Eşrefiyê ne, her kesî vîn û îradeya xwe di van hêzan de dît. Ji bo Sûriyê demokrat bibe, her kesî got gerek van hêzan re diyalog were kirin û ev hêz wê Sûriyê demokat bikin. Çima? ji ber ku hikumeta demkî komkujiya Elewiyan di meha Adarê de kirin, berî wê yên Durziyan çêbû, piştî wê careke din Durzî, Dêrên Xiristiyaniyan teqandin. Lewma ji ber her kesî vîn û îradeya xwe di van hêzan de dît, wan çi pêşxitin di ragihandinên xwe de, QSD’ê hêzên dixwazin Sûriyê parçekin. Yê herî ewlehî û serwiya Sûriyê parastî, Bakur û Rojhilatê Sûriyê, di milê xwe siyasî, civakî, leşkerî, xizmetguzarî û hwd… Ji bo wê ger Bakur û Rojhilatê Sûriyê parçebûna bixwazîba, wê parçe bikra hêza wê di hemû aliyan de heye. Ew û çapemeniya Tirk jî vê dizanin, ji ber ê serkêşiya vê dike û hikmetê birêve dibe Tirkiyê ye. Yê niha saziyên Sûriyê jî birêve û ragihandina Sûriyê orgenîze dike, Tirk in. Çîroka Tirkan bi dehê salan beramberî me dimeşîne.

**Hikumeta demkî li aliyekî bi gotinan ji pêkhateyên Sûriyê re dibêjin birayê me ne, li aliyê din nêzîkatiyên kiryarên hovane li hemberî wan didin meşandin, hun vê yekê çawa dinirxînin?**

Niha destpêkê gotin Kurd ne Sûrî ne, piştî her kesî gotin Kurd Sûrî ne, dîroka Kurdan heye, gotin Kurd birayê me ne, lê Rêveberiya Xweser û QSD’ê dijminê me ne. Piştre di Eşrefiyê û Şêxmeqsûd de çîroka destpêkê gotin QSD’ê û hêzên PKK’ê tê de ne û êrişî me dikin. Lê ji hêzên garantor bigre heya Tirkiyê û rejîma heyî ya Colanî, zanin ne QSD’ê ne jî PKK li wir hene. Ji ber hevpeyman çêbû û di taxan de berpirsyarên wan ên leşkerî û parêzgeha Helebê, tax tax geriyan, civîn çêkirin tiştek tunebû. Piştre gotin çi hêzên biyanî hene, hêzên biyanî çi ne, ber derkevin bêjin hêzên biyanî kî ne? piştre gotin bermahiyên Baas in, tişta avakirin xwestin nijadperestiyekê di navbera Kurd, Ereb û pêkhateyan de pêş bixin. Mixabin ê ku çîrok van çeteyan girt kî bûn, hin çapemeniyên Ereb ên dijber propaganda wan kirin, em jî tevlî wêna dibûn me digot çîroka wan ne raste, çîroka rast ev e, lê her tişt hatibû amadekirin di milê çapemiyê û leşkerî de. Dixwestin parçebûnekê ava bikin. Mînak dibêjin Elewî birayê me ne, lê Xezal Xezal ne birayê me ye! û yê Elewiyan temsîl dike Xezal Xezal e. Herwiha dibêjin Durzî birayê me ne, lê Hikmet El-Hicrî dijminê me ye, Hikmet El-Hicrî aqilmendê wa ye û yê wan birêve dibe ew e. Ji bo Kurdan jî vê dibêjin Kurd birayê me ne, lê QSD’ê û Rêveberiya Xweser parçebûna Sûriyê dixwazin û yê civaka Bakur û Rojhilatê Sûriyê û Kurdan temsîl dike QSD’ê û Rêveberiya Xweser e.

Mixabin çîrokekî wisa dane meşandin heta astekê jî civaka Sûriyê pê hate xapandin, ji ber civaka Sûriyê hingî zilm, zor û zext dîtiye, hinekî pê hate xapandin. Lê vê çapemeniyê nedît dibêje kesên biyanî di Sûrî de hene di Eşrefiyê û Şêxmeqsûd de, rast hene çawa? Ên ku êndama Hêzên Ewlekariyê şehîd kirin, serkirdeyekî çeteyên DAIŞ’ bû Ehmed Hemada Misrî, Misrî ye. Yên ku êriş kirin ji Uygor, Tirkmanistan û Çeçan bûn, ên ku niha di Şêxmeqsûd û Eşrefiyê de beyreqa radikin, beyreqa Tirke, ên ketinê de nijadperestên Tirkin ev in biyanî, dewletek di hundirê dewletekê de nabînin. Lê du taxên xwedî îrade di hundirê Helebê de, wan qebûl nakin.

Ev hemû di rêya çapemeniyê de jî vê ji raya giştî re radighînin. Şêxmeqsûd û Eşrefiyê taxên resen in, vîn û îradeya wan wê her tim li pêş be û di dîroka gelê Kurd de berxwedaniya hat meşadin, wê were nivîsandin.

**Ji bo valaderxistin şerê taybet ê di rêya ragihandinên dijber de hate kirin, rol û misyona çapemeniya Azad çi bû û ji bo ev yek vala bê derxistin, erke Çapemeniya Azad çi ye?**

Rûxmî kêmasiyên heyî Ragihandina Azad xebatekî pir mezin da meşandin. Li wir kesên ku heta astekî berxwedanî nîşan dan, Ragihandina Azad bû. 5 rojan tax bê internê hiştin, kehrebe hate qûtkirin û bi derfetên herî kêm, berxwedanî hate şopandin. Ji sedî dibe ku me 5 ji berxwedana wê şopandiye, ji ber zextê hatin kirin, ser ragihandinê hebûn. Lewma heta gel jî bi Ragihandina Azad re pareve dikirin, digotin win dengê me ne, bi me re parve dikirin. Gel bûn wek nûçegihan û peymnêrên Ragihandina Azad. Niha di Şêxmeqsûd û Eşrefiyê de, ji bo me pêwîst e em rexnedayîn jî bidin, ji ber ku me hinekî deha bêtir xwe milê pisproî de pêş xistiba, em ê karîbana beramberî ev şerên taybet û qirêj tê meşandin, hinekî rawestandibana. Niha du xet dimeşin, xetekî desthilatdariyê sîstemkariyê, xetekî civaka demokratîk, wekhev, civaka bi çand û exlaqe. Ragihandina Azad jî xeta civaka demokratîk temsîl dike. Em rexnedayînê wê didin û soza wê didin ku em ê bersiv ji her êrişekî ku civaka me rastî wê tê kirin, bidin. Me behsa çapemeniyê kir, niha hin hevalên me yên çapemeniyê nayên xuyakirin em nizanin niha li kur in, dema li her du taxan dişopandin, ev jî mînaka ku çiqas em rast êrişan têne kirin. Lê ji bo me gerek nebe behane, ew bibe hêz em diha bêtir xwe xurt bikin û bibin layiqê têkoşîna gel û berxwedana ku tê meşandin.

# ‘Divê Neteweyên yekbûyî li dijî dewleta Tirk û HTŞ’ê helwest nîşan bide’

Parêzerên kantona Cizîrê anîn ziman ku kiryarên desthilatdariya HTŞ'ê binpêkirina biryarên Neteweyên Yekbûyî (NY) yên bi hejmara 2254 û 2799'an e û bang li NY'ê kirin ku dijî dewleta Tirk û HTŞ'ê helwest nîşan bide.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Ji dema hatina hikumeta demkî ya Sûriyê li ser desthilatdariyê ve, binpêkirina soz, peyman û lihevkirinên niştîmanî-Sûrî bûye erka hikumeta Sûriyê ya demkî û wizareta wê ya derve. Ji wan peymanan a 1’ê Nîsanê ye ku di encama binpêkirina wê de şêrê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê rûda û komkujî bi serê gelê Kurd li her du taxan pêkhat. Piştî ketina her du taxan bin destê hikumeta demkî û çeteyên wê, êdî gefên êrişan li ser tevahiya Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji hêla çeteyan, dagirkeriya Tirk û hikumeta demikî ve zêdetri bûn. Armanca wan jî ew e ku peymana 10’ê Adarê têkbibin û şerekî mezintir bidin encamdan.

Derbarê binpêkirina hikumeta demkî ji peymanên ku bi QSD û Rêveberiya Xweser re îmze kirine û êrişên dermirovî li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê, parêzerên herêma Cizîrê Mihemed Emîn Niêmî û Xifran Xelef ji rojnameya me re axivîn.

**‘Desthilatdarî û kiryarên HTŞ’ê li dijî biryarên 2254 û 2799’an in’**

Mihemed Emîn Niêmî da zanîn ku desthilatdariya HTŞ’ê herwiha kiryarên wê binpêkirineke ji bo biryarên navdewletî û wiha bi lêv kir: “Rêxistineke cîhadîst a di nasname û pratîkê de ku desthilatdariyê li ser welatekî bike bêyî razîbûna gelan bi serê xwe binpêkirina zagonên navdewletî ye. Bi taybet her du biryarnameyên 2254’an a sala 2015’an û 2799 a sala 2025’an du zagonên navdewletî ne. Tişta ku li ser derewan hatiye avakirin bi xwe derew e û tiştekî batil e. Ji ber vê yekê, ne xerîb e ku rêxistineke terorîst her cûre sûcan li dijî gelê Sûriyê bi hemû pêkhateyên xwe bike, bêyî ku têkiliya wan bi vê rêxistina terorîst a bi navê Heyet Tehrîr Elşam re hebe. HTŞ’ê şaxekî rêxistina terorîst a Elqaîdeyê ye. Civaka navneteweyî, ya fermî û hem jî nefermî, ji vê rastiyê haydar e. Bêdengiya civaka navneteweyî ya fermî di derbarê van hemû rastiyan de ji fikarek xurt a ji bo berjewendiyan û tirsa ji ajendeyên siyasî yên nakok derdikeve. Lê belê, her tiştê ku bi vê rêxistinê û rêxistinên din ên cîhadîst ve girêdayî ye, kiriyarên wan diyar in, ew dizanin bi her tiştî, belge hene, hem jî ji berpirsiyariya navneteweyî li ber Dadgeha Cezayê Navneteweyî derheqê karê van rêxistinan ne dûr in. “Çareseriya yasayî û rola civaka navneteweyî ya fermî di biryarên 2254’an a 2015 û 2799’an a sala 2025’an de ye, çi di warê dabeşkirin û wesfkirina Heyet Tehrîr Elşam wekî şaxek ji Cebhet Elnusra an Elqaîdeyê de, çi jî di warê bicîhanîna Beşa 7’an a Peymana Neteweyên Yekbûyî ya 1948’an de, ev yek bi destwerdana Meclisa Ewlekariyê bi hêza navneteweyî tê temsîlkirin. ”

**‘Li Helebê sûcên dijmirovî li hemberî Kurdan pêkhat’**

Niêmî tekez kir ku li Şêxmeqsûd, Benî Zêd û Eşrefiyê sûcên dijmirovî derheqê Kurdan de pêkhat û wiha domand: “Peymana 10’ê Adarê û peymana Nîsana 2025’an heye, ya duyem berhema yekem e. Di her du peymanan de, yek ji aliyên van peymanan hevalbendekî nêzîk ê dewleta Tirk e, têkiliyek dişibihe têkiliya zarokekî bi diya xwe re. Ji ber ku dewleta Tirk di peymana 10’ê Adara de, bidawîbûna çavdêriya xwe li Sûriyeyê dibîne, bi



Emîn Niêmî



Xifran Xelef

taybetî ku ev peyman bê wê hatiye îmzekirin û deriyê destwerdana leşkerî ya Tirkiyê di hundirê Sûriyê de bi temamî digire. Herwiha tê xwestin ku çeteyên girêdayî HTŞ’ê û dewleta Tirk nema destwerdanê li ser axa Sûriyê bê kirin. Ev peymana jî di bingeha xwe de li dijî terorîzmê û vegerandina hemû deverên dagirkirî ye. Li Helebê diyar bû ku dewleta Tirk a dagirker, HTŞ û çeteyên girêdayî xew hemû sûcên dijmirovî li ser gelê Kurd li Şêxmeqsûd, Eşrefiyê û Benî Zeyd pêkanîn. Divê hemî sûcên ku ji hêla dewleta Tirk û çeteyên wê yên biyanî û herêmî, hem jî rêxistina cîhadîst a li ser textê Şamê rûniştiye, bi serokatiya serokê Elqaîdeyê Ebû Mihemed Elculanî bên belgekirin. Di heman demê de divê hemû şaxên vê rêxistinê ne tenê li Sûriyê, lê belê li derveyî Sûriyê bên kontrolkirin û cezakirin.”


**‘Rêxistinên mirovî li gorî poltîkayên dewletên serdest tevdigerin’**

Parêzer Xufran tekez kir ku rêxistinên mirovî li gorî siyasetên dewletên serdest li hemberî kiryarên dijmirovî bêdeng dimînin û wisa got: “Çima rêxistinên navneteweyî li hember binpêkirina mafên mirovan û binpêkirina qanûnan bêdeng dimînin? Helbet em dizanin ku ev rêxistin li gorî polîtîkayên dewletên cîhanî bi rêve dibin tevdigerin, ji ber vê yekê nikarin li dijî polîtîkayên welatên cîhanê nêrînekê nîşan bidin. Em dibînin ku ew dikarin bûyerekê li welatekî şermezar bikin, dema ku li welatekî din çi diqewime bêdeng bimînin. Bêdengiya rêxistinên mirovî ya li ser vê mijarê ji ber serdestiya siyasî ya li ser van rêxistinên ku sifeta xebata mirovî didin meşandin. Divê bê zanîn ku divê ev rêxistin û saziyên mirovî nekevin bin bandora siyasî, ji ber ku armanca wan a sereke parastina mafên mirovan be, bêyî ku siyaset an jî tiştek din be.”

**‘Divê hikumeta demkî û çeteyên wê werin cezakirin’**

Xufran Xelef da zanîn ku hikumeta demkî û çeteyên girêdayî dewleta Tirk ji ber van kiryarên xerab di dadgehên navneteweyî de bên cezakirin û wiha bi dawî kir: “Zagonên ku ji Civatên Cinêv derketin di hemû welatên cîhanê de ku tê de şer tê kirin, pêwîst in û divê werin bicihkirin. Rêxistina Mafên Mirovan a Neteweyên Yekbûyî jî pêwîst e van zagonan bi cih bike. Hikumeta demkî ya Sûriyê, di serî de her çar peymanên ên Cinêvê bin pê kirin. Ev peyman sivîlên diparêze, tevî ku şer hebe jî divê alîkariyên mirovayî ji sivîlan re pêşkêş bike qanûna navneteweyî ya mirovayî her carî were berxwedan.”

## Heleb çi nîşanî me da?



**Sînan Cûdî**

Tiştê ku li Şêx Meqsûd û Eşrefiyê qewimî, nikare tenê wekî pirsgirêka taxeke were xwendin. Van bûyeran bi zelalî nîşanî me dan ka çawa aştiya li Sûriyeyê dereng ket, çawa zext li Kurdan hat kirin, û çima ezmûna Rêveberiya Xweser ewqas hedef hat girtin. Heleb wekî modelek piçûk a pêşerojê ji me re hat pêşkêşkirin.

Pêşî, Heleb ev nîşanî me da: Pirsgirêk ne ewlehî ye, lê siyaset e. Tewra vekişîna hêzên ewlehiyê û saziyên Rêveberiya Xweser jî êrîşan nesekinand. Ji ber ku hedef ne hebûna hêzên çekdar bû. Armanc, fikra xwe rêvebirina Kurdan bû. Ji bo rejîma Şamê, Şêx Meqsûd û Eşrefiyê ne gefeke leşkerî bû lê mînakek siyasî bû. Ji ber vê yekê, hebûna meclîsa gel nayê tehemûlkirin.

Ya duyemîn, peymana 10ê Adarê wekî belgeyek aştiyê hat pêşkêşkirin, lê ji destpêkê ve, ji hêla Şamê ve wekî amûrek ji bo tasfiyeke dem dirêj hat plankirin. Nebicîhanîna peymanê ne kemasiyeke bû hilbijartinek bi zanebûn bû. Peymana 1ê nîsanê jî di vê çarçoveyê de divê were xwendin. Ji aliyê Kurd hat xwestin ku bi awayekî leşkerî vekişe, piştî vê yekê deverên sivîl û îdarî hatin hedefgirtin. Ev taktîka derengxistinê li Helebê hat sepandin.

Sêyemîn, vekişîn encam bû, ne sedemek. Derketina hêzên ewlehiyê û saziyan ji taxan wekî gavek ji bo pêşîgirtina li pevçûnê hat pêşkêşkirin, lê ewlehî di berdêla wê de pêk nehat. Berevajî vê, zext zêde bûn. Ev peyamek zelal bû ji bo gelê Kurd: “Her çend hûn vekişin jî, hûn ê di aştiyê de nemînin.” Ev peyam ne bi tenê li Helebê sînordar e, lê li ser tevahiya Rojava ye.

Çaremîn, Tirkiye di vê senaryoyê de ne çavdêrek nerasterast e, aktorek rasterast e ku şekil dide ye. Amûrên leşkerî yên ku têne bikar anîn û daxuyaniyên ku têne dayîn vê yekê venaşêrin. Ya girîngtir, destwerdana Tirkiyeyê ne di pevçûnê de ye bi Şamê yan hêzên din re. Berevajî vê, rêzek berjewendiyên hevbeş der barê qelskirina destkeftiyên siyasî yên Kurd de derketiye holê. Armanc li vir ne têkçûna leşkerî ye, lê tecrîda siyasî ye. Gelek hêz di vê armancê de li hev kirin.

Pêncemîn, Perspektîfa Aştî û Civaka Demokratîk tam ji ber vê sedemê dijberên xwe nerehet dike. Modela civakî ya ku di manîfestoya Rêber Apo de hatiye vegotin alternatîfek e ku çareseriyên dewletnavendî dixe ber pirsê. Tiştê ku li Helebê tê hedefgirtin ev fikra jiyana alternatîf e. Bi hilweşandina encumenên taxan, rêxistinên jinan û pratîkên biryargirtinê yên herêmî, civak bêparastin hiştine.

Ya şeşemîn, ev ne provayek ji bo êrîşek tevahî ye, lê ceribandinek cidî ye. Kurd dê çawa piştî vekişîna leşkerî bertek nîşan bidin, civak dê çiqas zû hilweşe û aktorên navneteweyî dê çiqas bêdeng bimînin. Ger ev ceribandin serketî derkeve, heman rêbazan dê li rojhilatê Firatê jî werin bikar anîn. Lê vê carê ne bi tankan, lê di bin sernavên “entegrasyon” û “rêkûpêkkirinê” de.

Encam: Ger Heleb Hişyariyek Be, Bersivek Jî Heye

Helebê wêneyek tarî nîşanî me da, lê bêhêvîtî fêrî me nekir. Berevajî vê, wê eşkeretir kir ku çi hewce ye ku were parastin. Şoreşa Rojava ne tenê serkeftinek leşkerî bû. Ew cesareta gel bû ku jiyana xwe panzdeh salan de karibû ava bike. Ev cesaret dema ku taxek tê vekişandin winda nabe. Dibe ku sazî bên hilweşandin, lê bîra rêxistinkirî nayê jêbirin.

Tiştê ku îro divê were kirin ne panîk e û ne jî bêdeng mayine. Ew e ku parastina xwe ya rewa ne tenê bi çekan, lê di heman demê de bi siyaset, hevgirtin û rêxistina civakî jî berfireh bibe. Pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk rêya herî rastîn ji bo vê herêmê ye jî. Ev gel ne bi bindestkirinê dikare were rêvebirin û ne jî bi zorê dev ji îradeya xwe berdide.

Heleb jî vê yekê bi bîr xist: Kurd ne tenê bi berxwedanê, lê bi sekinandina li cîhê rast qezenc dikin. Û cîhê rast, li kêleka gel e.

# Bêdengiya navneteweyî buhayê parçebûna Sûriyê ye

**Şaho Xanim**

Şîrovkirina bêdengiya tirsnak a navneteweyî ya li hember komkujî, binpêkirin, guhertinên demografîk û şerê qirkirinê yê li Şêx Meqsûd û Eşrefiyê wekî bêçareyî an bêçalakiyê şaş e. Ev bêdengî ne bêsedem e û ne jî bê armanc e; berevajî vê, ew helwesteke siyasî ya hesabkirî ye, armanca wê perçekirina Sûriyê ye. Li gorî mentiqa hêzên navneteweyî û herêmî, Sûriye êdî wekî welatekî serwer nayê dîtin, lê belê wekî projeyek vekirî ji bo ji nû ve dîzaynkirinê tê dîtin, li ser vê bingehê krîza wê tê birêvebirin û îstismarkirin.

Bêdengiya navneteweyî di bingeha xwe de peymaneke negotî ye ji bo ku Sûriye di rewşek bêîstîqrariyê de bimîne, ji ber ku her projeyek neteweyî ya berfireh ku erdnîgarî û biryardana siyasî ya welêt ji nû ve bi hev ve girêdide, berjewendiyên sereke yên hêzên navnetewî ku di salên şer de hatine avakirin, tehdît dike. Ji ber vê yekê, ew vê bêdengiyê wekî amûrekî zextê li ser Rêveberiya Xweser û QSD’ê bikar tînin.

Hêzên Sûriya Demokratîk (QSD) wekî yek ji hêzên herî sereke li dijî planên parçekirinê yên hin hêzên navnetweyî û herêmî, roleke mezin dilîze. QSD projeyek cudaxwaziyê û parçekirinê qebûl nekiriye, lê belê wê modelek pêşniyar kiriye ku li ser bingeha nenavendîbûnê di nav yekîtîya axa Sûrîyê de ye, herwiha ew di nav avahiya xwe de pêkhateyên neteweyî û olî yên cûrbecûr dihewîne.

Projeya ku ji hêla Colanî -HTŞ’ê û Tirkiyê ve tê temsîlkirin, di tu qonaxê de qet nebûye projeyek şoreşger an rizgariya neteweyî û avakirina Sûriyeke nû. Berevajî vê, ew projeyek bi tevahî parçeker e ku kaosê bikar tîne, ol wekî perdeyek û çek wekî amûrekê bikar tîne da ku tişta ji welat maye parçe bike û hilweşîne. Colanî ne tenê şoreş dizî, lê wî ol bi xwe jî tahrîf kir, ew ji sîstemeke nirxan veguherand amrazeke kuştin û dûrxistinê, herwiha di dawiyê de xizmeta projeyên ku ti têkiliya wan bi Sûriyeyê an berjewendiyên gelê wê re tune ye, kir.

Bi van rastiyan re, êdî ne mimkûn e ku bi polîtîkayên kevin berdewam bikin. Tiştê ku îro hewce ye, helwesteke siyasî ya zelaltir û wêrektir e ku mantiqa bêdengiya navneteweyî eşkere bike û êrişan wekî têkoşîneke di navbera projeyek neteweyî ya yekgirtî û projeyên parçebûnê yên ku sînoran derbas dikin de ji nû ve pênase bike. Yekîtîya Sûrîyê ne tenê sloganeke exlaqî ye, lê belê hilbijartineke siyasî ya biha ye. Yên ku wê hildibijêrin divê fêm bikin ku bedela wê dê tenêtîya demkî be, lê ew di encamê de, tekane vebijarka ku dikare tiştê mayî ji welêt rizgar bike.



# Koletiya modern; Bazirganiya bi mirovan

**Esma Mistefa**

Bazirganiya mirovan yek ji sûcên rêxistinkirî yên herî giran e li cîhanê. Tevî hewldanên navneteweyî ji bo têkoşîna li dijî bazirganiya mirovan, ev sûc hîn jî yek ji binpêkirinên mafên mirovan ên herî giran û berbelav li cîhanê ye, ji ber ku torên rêxistinkirî salan e bi mîlyonan mirovan îstîsmar dikin, ji feqîrî, pevçûnên çekdarî û qanûnên qels sûd werdigirin da ku mirovan veguherînin kelûpelên kirîn û firotinê.











**Bazirganiya bi mirovan çi ye?**

Bazirganiya mirovan wekî girtin, veguhestin, veşartin an wergirtina mirovan bi karanîna rêbazên neqanûnî tê pênasekirin. Wekî gef, tundûtûjî, xapandin, an jî bikaranîna rewşek lawaziyê, bi armanca bikaranîna wan. Ev kiryar wekî rengekî koletiya modern tê hesibandin ku xwe di bin navên cûda de vedişêre.

**Awayên istismarê**

Bazirganiya mirovan gelek şêweyan digire, bi taybetî îstîsmara cinsî, keda bi darê zorê, lavakirina zarokan, tevlîkirina zarokên temenbiçûk di şerên çekdarî de, bazirganiya organên mirovan û zewaca bi darê zorê. Hêjayî gotinê ye ku di vî sûcê de qurbanên herî bêparastin jin û zarok in.

**Faktorên herî zêde tên bandorkirin**

Raportên mafên mirovan destnîşan dikin ku penaber û kesên ku di hundirê welêt de ji cih û warên xwe bûne, xizan û bêkar di nav komên hedef ên sereke de ne. Nebûna parastina yasayî û nebûna derfetên jiyaneke baş wan dike nêçîreke hêsan ji bo torên bazirganiya mirovan.

Ev sûc bi gelemperî bi awayekî takekesî nayê kirin, lê ji hêla torên sûcên rêxistinkirî tê kirin û di gelek welatan de dewlet dibe alîkarê pêkanîna van sûcan!

**Hin sedemên derketina bazirganiya bi mirovan**

Xizanî deriyê îstismarkirinê ye: Xizanî û bêkarî sedemên sereke yên bazirganiya mirovan in. Di civakên ku ji hilweşîna aborî û kêmbûna derfetên kar dikişînin de, kes, bi taybetî jin û zarok, dibin hedefên herî hêsan ji van koman re. Ew ji aliyên van koman ve bi sozên derew yên weke avakirina derfetên kar ango koçberiyê tên xapandin.

Şer, koçberî û rewşa aborî zemînek berhemdar ji bo bazirganiya mirovan e: Şer û pevçûnên çekdarî roleke xeternak di xirabtirkirina vê diyardeyê de dilîzin, ji erk u ew dibin sedema koçberiya girseyî, hilweşîna civakî û hilweşîna pergala parastina yasayî. Di vê kaosê de, jin rastî îstîsmara cinsî tên, zarok neçarî karê bi darê zorê an jî karkirinê tên kirin, û penaber di torên qaçaxçîtiyê û koletiya modern de têne îstîsmarkirin.

Rewşa aborî û siyasî ya xirab dibe sedema koçberiya bi awayekî neqanûnî ya bi hezaran kesan ku ew dibin qurbanên qaçaxçiyan. Ew pir caran neçar dimînin ku ji bo vegerandina “deynên koçberiyê” bixebitin, di şert û mercên zorê de ku bi îstîsmar an tundûtûjiyê diqedin, bêyî ti parastina qanûnî.

Lawazbûna û nepêkanîna zagonan: Li gelek welatan, tevî hebûna qanûnên ku bazirganiya mirovan sûcdar dikin, lê sepandina qanûnê ya qels û gendeliya îdarî dibin sedema bêcezatiyê ji bo kesên têkildar. Ev rastî hestek ewlehiyê dide çeteyên sûcdar û sûc vediguherîne çalakiyek qezenckar û kêm rîsk.

**Pêkanîna van sûcan li ser jin û zarokan**

Jin û zarok dibin qurbaniyên sûcên bêdeng. Jin piraniya qurbaniyên bazirganiya mirovan pêk tînin. Bi taybetî di warên cinsî, karkirina bi darê zorê û zewaca bi darê zorê de. Sûc pir caran bi sozên derewîn ên derfetên kar an jiyaneke çêtir dest pê dike, lê bi windakirina azadî û rûmetê bi dawî dibe, û qurbanî dikevin nav lepên torên sûc ên ku tundûtûjî û gefan bikar tînin da ku rê li ber revîna wan bigirin.

Li deverên şer, êşa jinan girantir dibe, ji ber ku koçberî, xizanî û nebûna parastina qanûnî di nav bêdengiya civakî û tirsa ji şermezarkirinê de wan vediguhezîne kelûpelên kirîn û firotinê.

Her wiha zarok di vî sûcî de yên herî bêparastin in. Ew bi zorê tên xebitandin, parsekiya rêxistinkirî, îstismara cinsî, an jî di şerên çekdarî de tên tevlîkirin. Di hin rewşên şok de, ew heta rastî bazirganiya organan jî tên. Şer, windakirina debara jiyanê, xizaniya zêde û nebûna perwerdeyê faktorên sereke ne ku zarokan dikin nêçîra hêsan a çeteyên bazirganiya mirovan, yên ku bêgunehiya wan û pêdiviya wan a ji bo jiyanê îstismar dikin.

**Hewldanên navneteweyî ji bo têkoşîna li dijî vê diyardeyê**

Li ser asta navneteweyî, peymanên Neteweyên Yekbûyî, bi taybetî Protokola Palermo ya NY, bazirganiya mirovan wekî sûc dibînin. Ev yek dewletan mecbûr dike ku van kiryaran sûcî bikin û qurbaniyan biparêzin. Her çendî li gelek welatan qanûnên taybetî ji bo têkoşîna li dijî bazirganiya mirovan derxistine jî, bicîhanîna wan hîn jî dijwariyeke. Bazirganiya mirovan sûcekî bêdeng e ku bi dizî tê kirin, lê bandorên wê li ser kesan û civakan wêranker in. Têkoşîna li dijî wê hevkariyeke navneteweyî ya rastîn, qanûnên hişktir, hişyarkirina raya giştî û parastina komên herî lawaz hewce dike, da ku rûmeta mirovan û mafê azadî û jiyaneke ewle were misogerkirin.

**Protokola navneteweyî**

Protokola Pêşîlêgirtin, Tepeserkirin û Cezakirina Bazirganiya Mirovan, Bi Taybetî Jin û Zarokan, ku Peymana Neteweyên Yekbûyî ya li dijî Sûcên Rêxistinkirî yên Navneteweyî temam dike, ji 20 madeyan pêk tê.

**Rêxistina Polîsên Sûc ên Navneteweyî (interpol)**

Operasyona Global Chain (1-6’ê Hezîrana 2025’an) de ji bo bazirganiya mirovan destpê kiribû. Di operasyoneke mezin a dijî bazirganiya mirovan de 1,194 qurbanî hatine destnîşankirin û 158 gumanbar hatine girtin. Lêpirsînên berdewam 205 kesên din jî ku guman tê kirin ku tevlî bazirganiya mirovan bûne, derxistine holê.

Kampanyaya cîhanî li ser têkoşîna li dijî bazirganiya mirovan ji bo îstîsmara cinsî, karkirina bi darê zorê û parsektiyê, bi taybetî bal kişand ser qurbaniyên temenbiçûk. Nêzîkî 15 hezar efserên polîs, cerdevanên sînor, mufetîşên kedê û karmendên bac û gumrikê ji 43 welatên cuda tê de beşdar bûn.

**Welatên ku herî zêde tê de bazirganiya mirovan tê kirin**

Asyaya Başûr: Hindistan, Bangladeş, Nêpal û Pakistan di nav welatên pêşeng ên ku qurbaniyan îxrac dikin de ne ku jin û zarok di karên bi zorê, fihûş, parsektiya rêxistinkirî û firotina zarokan di bin navê xwedîkirin an zewacê de têne îstismarkirin.

Afrîka: Li welatên wekî Nîjerya, Etiyopya, Sûdan, Lîbya û Komara Demokratîk a Kongoyê, ev diyarde ji ber pevçûnên çekdarî û hilweşîna aborî girantir dibe. Zarok di karên xeternak de têne bikar anîn an jî bi zorê têne girtin, di heman demê de jin bi rêya torên koçberiya neqanûnî têne firotin.

Rojhilata Navîn: Lîbya, Yemen, Sûriye û Iraq navendên çalak ên bazirganiya mirovan in, bi taybetî di çarçoveya pevçûnên berdewam de. Penaber û kesên ku ji welatê xwe hatine derxistin ji bo karê bi darê zorê an jî fihûşê têne îstismarkirin, di heman demê de jin ji ber nebûna parastina qanûnî rastî îşkenceyên giran tên.

Ewropaya Rojhilat: Welatên wekî Ukrayna, Moldova, Romanya û Bulgaristan di bazirganiya jinan bo Ewropaya Rojava de gelek çalakin, li wir ew rastî îstismara cinsî tên an jî neçarî çalakiyên neqanûnî dibin.

Amerîkaya Latîn: Li Venezuela, Kolombiya û Meksîkayê, krîzên aborî û sûcên rêxistinkirî torên bazirganiya mirovan xurt dikin, nemaze bi zêdebûna koçberiya bi darê zorê ber bi Dewletên Yekbûyî ve.

Di dawiyê de…Kêmkirina bazirganiya mirovan ji qanûnên yasayî bêtir hewce dike; ew pêdivî bi çareserkirina sedemên bingehîn ên pirsgirêkê, di serî de xizanî, pevçûn û parastina komên lawaz, digel hevkariyek navneteweyî ya rastîn ji bo şopandina torên sûc û rizgarkirina qurbaniyan heye.

Hikumet berpirsiyariya sereke di sînordarkirina vî sûcî de hildigirin ser xwe, bi derxistina qanûnên hişk ku hemû cûreyên bazirganiya mirovan bê îstîsna sûcdar dike, divê dest pê bike. helbet ev yek divê bi garantiya ku ji aliyên siyasî û civakî dur be. Her wiha perwerdekirina dezgehên bicîhanîna qanûnê, di nav de polîs, dadwer û dozger, gaveke girîng e di eşkerekirina van sûcan û muamelekirina qurbaniyan wek qurbanî, ne wek sûcdar.

Têkoşîna li dijî bazirganiya mirovan ne tenê berpirsiyariya hikumetan e; civak di şerê dijî wê de roleke girîng dilîze. Zêdekirina hişmendiya raya giştî li ser xetereyên vê sûc û rêbazên ku ji bo xapandina qurbaniyan têne bikar anîn, bi taybetî bi rêya medyayê û saziyên perwerdehiyê, dibe alîkar ku pêşî li wê were girtin.

## Dewleta Tirk navenda fitnê ye



**Hafiz Ahmet Turhalli**

Dewleta Tirk û rêveberiya wê navenda fitnê ne. ji Somalî bigrin heta Libyayê, ji Çînê bigrin heya Emerikayê karê wê tevdan û tevlîhevî ye.

Ji bo aramî û aşitî pêk neyê li hemû cîhanê yarmetî û hevkariya şer û tevliheviyan dike.

Tevliheviyên navdewletî dike, lê ji ber hêza wê têrê nake, hemû fitneya xwe li ser Kurdan pêk tîne.

Ev sed sale Kurd perçe kir û agirê fitnê di nava Kurdan de pêşxist. Carna bikaranîna ol û mezheban, carna bikaranîna bîrdozî û ramanên sîyasî, carna bikaranîna lehce û devokan fitneya xwe pêşxist. Hemû hêza xwe ji bo fitnê di nav me Kurdan de pêşbixe bikar aniye û tîne. Şerê heta vê gavê jî di nav Kurdande derdikevin, fitneya wê ye. Şerên di nava me Kurdan de derketine û nehezkirina me ji hev re, sedemê wê yê bingehîn eqlê fitneya dewleta Tirkan e.

Sedemê perçebûna welatê me û rewşa neha em tê de jî ev eqle.

Naxwaze em Kurd li ruyê erdê nefes bigrin û bijîn. Ji bo wan tenê ev derbasadare, „Kurdê herî baş Kurdê miriye!“

Divê milletê me vê heqîqetê ji xwere bike „Amentû“ û li gor wê tevger bike. Divê ev tiştên ez dinivîsim jibo hemû desthelat û dagirkerên Kurdîstanê derbasdar bin, lê serkeşiya wê dewleta Tirk û eqlê fitnê ye.

Mirov dema temaşe dike, vê rastiyê dibîne: Haqan Fîdan yekê dê û bavê wî Kurd in, lê ew fitneya herî kur e li dijî Kurdan.

Eqlê dewleta Tirk, bi vî rengî kar dike û herî zêde Kurdên Manqurt li dijî Kurdan bikar tîne.

Dema mirov vî eqlî dibîne, mirov rewşa gelê me zêdetir fêm dike û pêwistî dibîne ku hemu cureyên vê eqlê ji nava xwe derbixe û dijî vê eqlê prastinekî xurt ava bike.

Divê em weke Kurdan vê eqlê baş nas bikin û tekoşîna xwe, ji bo têkbirina vê eqlê saz bikin.

Senteza Îslama Tirk fitneya herî mezine ji bo me Kurdên misilman e. Evê fitnê rewşekî weha di nava me Kurdan de afirandiye ku Kurdê Misilman bi navê Îslamê bûne neyarê xwe û ola Îslamê!

Kurd dibêje qey ji bo Xwedê û Îslamê dire Mizgeftê: lê di mizgeftan de ev gotar tê pêşkêşkirin: Xwedê mala we Kurdan belav bike, Xwedê koka we Kurdan bîne we di agirê dojehê de bişewtîne.

Kurd bi navê ol, Xwedê û Pêxember ji vê malxirabiyêre dibêjin Amîn.

Ji vê fitnê û xirabiyê mezintir tiştekî dîtir li jiyanê heye?

Em dibînin gelên dîtir yên Misilman, binavê Îslamê azadiya xwe û welatê xwe bidest anîn. Gelo çima û çawa, Kurdên Misilman bi heman baweriyê azadî û welatê xwe jidest dan?

Em dikarin bêjin dagerkeriya eqlê Tirk, Kurd nexweş xistiye û Kurdê oldar bi piranî vê nexweşiya giran dijî. Dermanê wê jî durketina ji eql û baweriya senteza Îslama Tirk de ye.

Bibînin li Şêxeqsud û Eşrefiyê çi bi serê me tînin, dixwazin me hemuyan qir bikin. Tenê rêyekî me Kurdan maye, ji hişmendiya dagirkeran durketin û li ser hişmendiya mîlletperwerî û welatperwerî xwe birêxistinkirin.

Ger em xwe liser van nirxan rêxistin bikin, emê karibin azadiya xwe bidest bixin.

Sala 2026 ’an divê bibe sala îttîfaq û desthevgirtina me Kurdan. Kurd heqîqeta vê fîtneyê bibînin, dê karibin dergeh û pencereyên azadiyê heta dawî lixwe vebikin.

Ne xeflet û hêvî şikestin, berovajî tekoşîn û serkeftin li benda me ye.